
# ZERDEŞTÎ Û ÊN MED




**(Hevp'eyvîna doktorê dîrokzanîyê Îsmet Konak bi zimanzan, nivîsk'ar û r'ojnameger Ezîz ê Cewo r'a)[1]**

**Erka** ***bawerîdarîyê (şorinbêjîyê)***

erka p'eyamdarîya bawerîya xwe pêk anye;

**Helbestvan û nivîsk'arê osmsnî-t'irkî yê dawîya sedsala XIX û destpêka ya XX Cenap Şahabettîn gotye, ku** ***mirov dikare, çi ku baxwsze, wê bi dîrokê bide gotin, lewra ku yên mirî nikarin li dijî derk'evin …***

**Dîroknûsên wan dewletan, ên ku r'astîya pêkhatina** ***gelê k'urd*****, wek net'ew, ji bo xwe wek gefekê (t'ehdîd) dîtine, hema r'êbazeke vî r'engî li hember dîroka wî bi k'ar anîne. Bi wî awayî, ewana dîrok anegorî berjewendîyên "pêkhatina" xwe nivîsîne, û t'êzên xwe yên "zanistî" jî ewana li ser bingeha agahîyên berovajîkirî, yên lêp û derew ava kirine.**

**Ewana heman r'êbaz di lêger'înên di warê zerdeştîyê da jî ji xwe r'a kirine bingeh.**

**Di lêger'înên xwe yên zanistî da k'urdzanê sovêtî Ezîz ê Cewo (Mamoyan) di vê pirsê da bi bingehîn giranîyê dide ser t'erefê heşmendîya pêşk'evtinên dêrokî û analîza zanistî ya nimûneyên zimên. Eew li ser bingeha nirxandinên agahî û daneyên serdemên cuda dîtinên p'ir' balk'êş derdixe pêş, yên ku ji bo r'onîkirina r'astîya dîroka Medya kevnar û gelê k'urd, ya ku hatye lêpvajîkirin, p'ir' girîng in. Ew di p'irtûka xwe ya "Zerdeşt pêxember. (Rûpelên diroka "windabûyî")..." da r'ûp'elên "tarî" yên dîroka jîyan** ***Zerdeşt P'êxember*** **û pêkanîna erka wî ya p'eyamdarîya bawerîya zerdeştîyê û pêkhatina** ***Avêsta pîroz*** **derdixe r'onahîyê...**

**Û hema di derbarê wan pirsan da jî gotûbêja me bi Ezîz ê Cewo r'a pêk hat.**

**Ew di lêger'înên xwe yên zanistî da ji bilî berhemên nivîsk'ar û dîroknûsên serdemên cuda, wisa jî ç'avkanîyên dinê, bi t'aybet jî yên r'ûsan û ermenîyan bi k'ar tîne, yên ku ji alîyê pispor û lêger'îneran va ji vê hêlê va nehatine bik'aranîn.**

---

**– P'irtûka We ya dawîyê weha tê navkirin:** ***"Zerdeşt pêxember. (Rûpelên diroka "windabûyî")..."*** **– Bi r'astî, ev şêwazdayînek a balk'êş e! We di nava vê sernivîsê da bi t'aybet çi mabest danye? We bi wan gotinan xwastye çi bibêjin?**

–Bi r'astî jî, wek prênsîp, divê hema wisa jî hebûye. Her sernivîsek, her sernavek divê binemabestên (postûlat) sereke yên berhema konkrêt bi awayekî bide xuyan, an jî, heya mirov dikare bibêje, ew divê di wê derbarê da bide daxuyandin! Divê her sernivîsek ji bo xwendevanan wek bangekê be, bala wan bik'işîne ser naver'oka berhemê bi xwe. Heya astekê, ew divê r'ola bangawazîyekê pêk bîne.

[1] Navnîşanên êlêktronî yên beşdarên hevp'eyvînê ev in: ya Îsmet Konak – smtknk1982@gmail.com û ya Ezîz ê Cewo – mamaziz@yandex.rû .

Carna mirov dikare bi gotinekê wê bîne zimên, a ku bi giştî di naver’oka berhemê bi xwe da heye, an jî armancên wê yên sereke li ber xwendevan veke…

Ya ku naha em di derbarê wê da diaxivin, ne hema wisa sernavek e, ew stûna navendî ya naver’oka p’irtûkê ye, wek lêger’îna zanistî, û mabesta wê ya sereke ye (lêytmotîv), ya ku di derbarê wê da tê vegotin,

Ev sernava hema wisa bi carekê va pêk nehatye. Di destpêkê da di sernavê p’irtûkê da li şûna p’eyva *“windabûyî”* min çend p’eyvên cuda li ber hev guhar’tin: yên wek *“ên dizî”*, *“...şêlandî”*, ... *“... t’alankirî”*... Heya di despêkê da min xwest ji bo p’irtûkê sernavê *“Zerdeşt P’êxember: gelo em her tiştî di derbarê wî da dizanin?”* hilbijêrim. Bi vê sernivîsê demekê çend r’êzegotarên min hatibûn weşandin... Paşê, bi demê r’a, ez hatim ser wê nêr’înê, ku ew herdu cudaşêwazên (varîant) destpêkî bêhtir paşdîtî ne, û di wan da bêhtir hest serdest e. Lê ya dawîyê goveka wan pirsan, ên ku dihatin lêger’andin, zêde teng dikir. Hê dereng, bi pêvajoyê r’a min p’eyva *“windabûyî”* hilbijart. Ew bêhtir bêt’eref tê xuyan, û bi wê r’a – bêhtir berfireh û bi naver’ok e... Ne wisa? Ma ne, hîç tiştek hema wisa winda nabe, berî wê gelek tişt pêk tên, ên ku bûyerên konkrêt didin r’ûdan...

De, îjar her’e û serederîyê li wan bike?!

Dibe hinek bipirsin – çima *“windabûyî”*, ma ne, di pêvajoyeke dusud salî da ewqas lêger’înên zanistî hatine nivîsîn, bi vê mijarê ewqas berhemên *wêjeyî, awazhunerî û yên hunera bedewetîyê (wênegerîyê)* hatine afirandin?

Erê, wisa ye! Di wê demajoya dîrokî da lêger’îneran, nivîsk’aran, wênegeran û sazbendan bi bingehîn bala xwe dane ser t’erefê bîrûbawerîya Zerdeşt ê felsefî, nirx û hêjahîya wê di pêşveçûna r’amana mirovî da. Wê demê hûrbînîyên dîrokî yên p’eydabûna wê bîrûbawerîyê an jînenîgarîya Zerdeşt P’êxember bi xwe kêm bala wan k’işandine. Jixwe bala wana bi wan agahîyên lêpovajîkirî hatine dagirtin, ên ku ç’irokbêj-nûserên lêpok’ar- sextek’arên dîrokê yên sedsalên navîn li dû xwe hiştine, yên ku li derdorê qesrên desthilatdaran k’arê xwe pêk anîne.

Û ev jî r’ewşeke xwezayî bûye: wê serdemê ji bo wan kesan bêhtir naver’oka vê bîrûbawerîyê bi xwe û mezinahîya Zerdeşt P’êxember, wek fîlosof, baldar bûye, yê ku sert’aca r’amana mirovî afirandibûye.

Lewra jî, serpêhatîya jîyana evî Mirovê Mezin û welatê wî ji bo wan kesan wisa jî di nava efsane û ç’îrokên cihêr’eng da veşartî mane.

Û ev hemû jî, bêdadîyek e, ne wisa?!

Mirov divê ne ku t’enê serpêhatîya jîyana Zerdeşt P’êxember û pêkanîna erka wî ya p’eyamdarîya bawerîyê bizanibin, lê, wisa jî, wê r’astîyê derxin r’onahîyê, k’a agahî û daneyên dîrokî çawa û ji hêla k’ê va hatine lêpovajîkirin.

Ev p’irtûka her t’enê destpêkek e. Di wê da her t’enê ew guhar’tin û lêpovajîkirinên agahî û daneyên dîrokî hatine nirxandin û r’onîkirin, ên ku wê serdemê pêk hatibûne. Ewana ji p’ir hêlan va bi zanistî hatine analîzkirin (ji hêla dîrokî û zimanzanîyê va), û ji bo gelekan bersîvên bi zanistî misoger hatine dîtin û r’ê û r’êbazên lêger’înên di wî warî da hatine destnîşankirin, yên ku divê ji vir û pêva bên meşandin.

**– Çi têk’ilîya k’urdan bi zerdeştîyê r’a heye? K’urdan çawa û k’engê ew p’ejirandine?**

– Ji bo ku bersîva vê pirsê bê dayîn, di sêrî da divê bê makkirin, k’a *k’urd* k’î ne! Û ew makkirina divê ne ku anegorî ç’îr’ok, efsane û gotegotên hinartî û bêwat’e yên farsan, ereb û t’irkan bê pêkanîn, lê bi zanistî.

Helbet, îro êdî mirovên wisa tarî û nezan kêm mane, yên ku ji efsaneyên ç’îrokbêjên derdorên qesrên dewletên mêtînger bawer bikin. Lewra ku ew ç’îrokana dûrî heş û sewdayê mirovê t’endurust in. Ç’avkanîyên kevnar û yên sedsalên navîn hene, yên ku bi

bingehîn hemû lêpovajîkirinên dîroka gelê k'urd vala derdixin û r'ed dikin. Di nava wan da bi t'aybet ç'avkanîyên ermenîyan hêjayî baldarîyê ne.

Dibe ku li vira hinek bipirsin, k'a çima, hema ç'avkanîyên ermenîyan?

Pirs di wê da ye, her çiqas di vê herêmê da hemû gel bi awayekî cînarên hev in, lêbelê, t'aybetîyên têk'ilîyên k'urd û ermenîyan bi dîrokî cuda bûne. Heya dewra dewra VI a b.z. ermenî di Frîgîyayê da mane. Lê mercên dîrokî wisa pêk hatine, ku ew neç'ar bûne, dest ji cî-miskenê xwe berdin... Û li ser r'êya ku ji bo xwe cîyekî p'eyda bikin, ku lê bihêwirin, ewana digihîjin ber sînorên Împêratorîya Medyayê, berbir'î desthilatdarên wê xahermendîya gewre dibin, ku wan bihêwirînin. Û p'adişahê Medîyayê yê wê serdemê, *Ûvaxşatra* (Vîştaspa/Kîak'sar) bi hinek şert û mercan p'arç'eyê kafkasî yê Ûrartûyê, ya ku ewî bi xwe wê demê êdî hilda bûye û kiribûye nava sînorên împêratorîya xwe ya gewre, ji bo ku ew li wira bihêwirin. Paşê, hê derng, r'êvebirîya Medyayê biry'ar dike, ku serkêşê p'enaberên ermenîyan ê bi navê Parûyr t'acîdar bike, û dewletê ji bo wan dadimezirîne. Û ji wir û pêva dewleta ermenîyan a nûdamezirandî di bin sîwana Împêratorîya Medyayê û di nava goveka bandora çanda wê da pêş dik'eve. (Di vê derbarê da, bi hûrbînî: *Минорский В. Ф.*, Курды. Заметки и впечатления, Петроград, 1915 г., стр. 6 – 7 // *Mînorskî V. F.,* "Yên kurd. Têbînî û bîranîn", Pêtrograd, 1915, r'û 6 – 7; *Ekrem Cemîl Paşa*, Dîroka Kurdistan bi kurtebirî, Bruksel, 1995, r'û: 231 – 234; *Մովսես Խորենացի*, Հայոց պատմություն, Երևան, 1991, էջ 123–131 // *Movsês Xorênatsî*, Dîroka Ermenîstanê. Yêrêvan, s. 1991, r'û. 123 – 231; *Геродот*, История, I, раздел 108// *Hêrodotos*, Dîrok, I, beşê 108; *Սիոն Վարդապետ Տէր-Մանուէլեան*, «Եզիդի կուրմանձ», Ախալցխա, 1910, էջ 3 – 4//*Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan*, "Kurmancên yêzîdî", Axaltsxa, s. 1910, r'û. 3 – 4).

Di derbarê wê bandora çandî da, ya ku medan li ser ermenîyan hiştye, agahîyên balk'êş li bal erdnîgarzan û dîrokzanê kevnar ê yewnanî Strabon hene. Weha, ew çi dinivîse: "*... Yên med, lêbelê, wek ku dibêjin, bavpêşîyên kevneşopîyên ermenîyan bûne, hê berî wan ew bavpêşîyên kevneşopîyên farsan, serdarên wan û peyhatîyên desthilatdarîya wan a di Asîyayê da bûne...*" [*Страбон*, География, XI книга, Москва, 1964, стр. 525//*Strabon*, "Erdnîgarî", pirtûka XI, Moskova, 1964, r'û. 525].

Li vira divê bê gotin, wek ku tê xuyan, dema Strabon p'eyva *kevneşopî* bi k'ar anye, mabesta wî *çand* bûye, bi wat'eya fireh a vê p'eyvê va... û pêşîyên ermenîyên îro, wek gel, bêhtir di nava goveka çanda medan da pêş ketine, ji wan jî hema ola zerdeştîyê p'ejirandine...

Bi vî awahî, medan di dîroka gelê ermenî da r'oleke weha ya ç'arenûsî lîstine!

Lewra jî di ç'avkanîyên ermenîyan da di derbarê medan û k'urdan da, wek peyhatîyên wan ên r'astedêr, agahîyên balk'êş hatine parastin. Dema dîroknûs û nivîsk'arên ermenî di derbarê k'urd-medan da dinivîsin, ewana ç'avkanîyên bîyanîyan ji xwe r'a bingeh nagirin, ewana di derbarê wan da wê dinivîsin, çi ku bi xwe li ber ç'avê xwe dîtine, an jî bûne govahên (şahid) bûyerên pêkahtî.

Ji bo ermenîyan k'urd ne ku t'enê peyhatîyên r'astedêr ên medan in, lê wisa jî heya sedsala XVI ji bo wana k'urd û med haman net'ew bûne. Dema ermenîyan gotine *k'urd*, mabesta wana *med* bûne, û, berovajî vê, dema gotine *med*, mabesta wana *k'urd* bûne.

Di vê derbarê da govenîyên nivîskî yên pêbawer di ç'avkanîyên sedsalên navîn ên ermenîyan da hatine parastin.

Weha, t'enê çendek ji wana:

"... Berbangê zû *yên med* hatin, ên ku ji wan r'a *k'urd* dibêjin". – Ev bûyer, a ku di derbarê wê da li vir tê gotin, ango hatina *k'urd-medan* a ber dêra ermenîyan a T'spnê, 19-ê gulana 1426-an pêk hatye (Արիստակես Տնկանց, Հայերգ, Թիֆլիս, 1882, էջ 175 – 180//Arîstakês Têvkants, "Hayêrg", T'îflîs, 1882, r'û: 175 – 180;).

Û – yeke dinê:

---

"... Binecîyên wî welatî, yên ku k'urd in, ji wan r'a *med* dibêjin" (Հայաստանի

Մատենադարան, XVI դարի ձեռագիր, № 1495, էջ.էջ. 142ա և 142բ// Matênadarana Ermenîstanê-Înstîtûta destnivîsên kevnar, desrnivîsa dewra XVI, №1495, r'û. 142a û 142b).

Agahîyên balk'êş wisa jî li bal r'onaydarê ermenî yê mezin ê sedsala XIX Xaçatûr Abovyan jî hene. Bala xwe bidinê, ewî di têbînîyên berhema xwe ya "Ên k'urd" da çi nivîsye: *"Çamçyan di p'irtûka xwe ya Dîroka Ermenîյան da (berga I, serîyê 10, r'û. 100 ) li dû hev navên hemû nûnerên medan (*ango, *walî.* – E. C.*) anegorî dîroknûsên yewnanî, yên wek Hêrodotos, Dîodoros, Alîkar û yên dinê ji Arbûkês heya Diyokês r'êz dike, dibêje, ku yên med (ango, k'urdên kevnar) li dora t'or'inên xwe lap ji hev cuda jîyane..."* (*Աբովյան Խ.* Երկերի լիակատար ժողովածու, ութ հատորով, ութերորդ հատոր. – Երևան, 1958, էջ 284// *Abovayan X.* Berevoka berheman a t'am, bi heyşt bergan, berga heştem. – Yêrêvan, s. 1958, r'û. 284).

Bala xwe bidinê, li vira têgihîştineke balk'êş dertê pêş mirov, ne wisa: *"ên med, ango k'urdên kevnar"*. Ango, ji bo ermenîyan *t'imê jî ên med k'urdên* kevnar bûne!

Û di berhemên dîroknûsên ermenî yên demên bêhtir nêzîkî me–yên destpêka Sedsala XX da jî agahîyên weha hene.

Weha, t'enê bala xwe bidin hinek agahîyên ji p'irtûka "Kurmancên yêzîdî" ya *Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyanê* ezdezanê ermenî yê destpêka sedsala XX: **"êzdîyên kurmanc – peyhatîyên medan", "êzdîyên îro – peyhatîyên Astîagê p'ir'hespî", "peyhatîyên Êkbatanê –dewleta demekê ya gewre, êzdîyên kurmanc", "cînarên me yên îro yên xêrxwaz kurmancên êzdî ... şaxekî medên bi hêz û zor, peyhatîyên Astyagê ji binemala Vîştasp in"** (*Սիոն Վարդապետ Տէր-Մանուէլեան*, «Եզիդի կուրմանժ», Ախալցխա, 1910 //*Sîon Vardapêtt Têr-Manvêlyan*, "Kurmancên yêzîdî", Axaltsxa, 1910, r'û. 3 – 4 û 41).

Lêbelê, di t'evahîya van hemûyan da, ya ku herî zêde hêjayî baldarîyê ye, ew e, ku, her çiqas, p'ers (fars) bi r'êya derbeya hindur'în a qesrê di Medyayê da bûne hevp'arên desthilatdarîê, û paşê li ser bingeha wê dewleta xwe ava kirine, bûne *mîrat'girrên* Împêratorîya Medyayê, lê ermenîyên cînar, her çias ew wê demê vassalên farsan jî bûne, t'u carê ew û med yek nedîtine, heya ew mînanî hev jî nekirine. *Lê yên k'urd û med ji bo ermenîyan bi dîrokî hert'im jî yek net'ew* bûne.

Û lewra jî, ji ber ku:

– *zerdeştî*, wek bîrûbawerîya olî, di Medyayê da pêk hatye û di nava gelê wê da belav bûye, û, yên med (*k'urdên kevnar*) bi xwezayî bûne bawermendên wê yên yekem; (derdorê sed û bîst sal berê di cîhana zanistê da êdî nêr'înk derk'etibûye hole, ku bîrûbawerîya *Zerdeşt* ola binecîyên kevnar ên Îranê bûye – di sêrî da ya medan, baktrîyan û, paşê, ya p'ersên (fars) dema Hexemenîyan û Sasanîyan. (Di vê derbarê da – Энциклопедический Словарь *Ф. А. Брокгауза и И. А. Ефрона*. – СПб., 1890–1907. – Т. $22^{A}$. – С. 881–884 // Ferhenga êntsîklopêdî ya *F. A. Brûkhaûz* û *Î. A. Yêfron*. – SPb., s. 1890 – 1907. = Berga . $22^{A}$. – R'û. 881–884).

– ji wan gelan, ên ku di dema xwe da *zerdeştî* p'ejirandine, t'enê *k'urd* in, ên ku heya îro di nava wan da gelek *asa (norm)* û *ferzên zerdeştîyê* û nirxên r'ewanî yên giştî zêndî mane, her çiqas, berî zêdetirî 1350 salan bi zora şûr olek a bîyanî li stûyê wan alandine.

Û, bi xwezayî, ji ber ku zerdeştî, wek bîrûbawerî, li ser bingeha wan bawerîyan pêk hatye, yên ku êdî berî wê di *Medyayaê* da hebûne, û ew bi r'ehên xwe yên r'ewanî va bi wan bawerîyên gelêrî va p'ir' girêdayî ye, lewra jî ew ne ku t'enê ji bo k'urdên îroyîn ne bîyanî ye, lê berovajî vê, ew bêhtir wek r'ûdana xwezayî ya rewşa wan a rewanî-sewdayî ye. Weha, di vê derbarê da r'ojhilatzanê sovêtî yê navdar *Î. M. Dyakonov* çi dinivîse: *"... zerdeştîyê p'ir'anîya wan bawerîyan û dirozgeyên ayînî jinûva ji ber xwe dernexistine, ewê ew ji nava bawerîyên gelêrî yên berî xwe hildane, yên ku wê demê kêm-zêde êdî amade*

*bûne...* " (*Дьяконов И. М.* История Мидии. – М. – Л., 1956. – С. 45–55 //. *Dyakonov Î. M.*, Dîroka Medyayê. – M. – L., 1956. – R'û. 45 – 55).

Û, dibe ku lewra jî, di wê derbarê da, ku ew nûnerên net'ewa med in, di bîra k'urdên îro da li ser asta gênêtîkî hatye p'arastin.

Ji vira jî, hema bersîva pirsa we dertê hole: ji ber ku k'urd peyhatîyên r'astedêr ên medên kevnar in, û ola zerdeştîyê bi xwe jî di *Medya kevnar* (*mak-welatê k'urdan*) da pêk hatye û belav bûye, ew bi xwe govenîya wê ye, ku *med* (*k'urdên kevnar*) *zerdeştîyên* yekem bûne, û k'urdên îroyîn mîrat'girên vê bîrûbawerîya kevnar in.

Dê heşmendî bûya, eger mirov hema di wê civakê da dest bi lêger'îna şopên bingehên zerdeştîyê bikira, li k'u cara yekem ew p'ejirandine, bi t'aybet jî di nava wan da, yên ku bawerîyên wan ji bo p'eydabûna bîrûbawerîya *zerdeştîyê* bûne bingeha berhemdar. Ango, bingehên wê bîrûbawerîyê divê di nava k'urdên êzdî da biger'in (li vir girîng e, ku mirov *êzdîyan* û *êzîdîyan* t'ev li hev neke. Eger *yên êzdî* k'urd in, ên ku ola kevnar – êzdîtîyê bawer dikin, lê *yên êzîdî* bawerîya wan şaxekî îslamê yê *sofîyan* e (bi erebî wisa jî – التصوف), û civaka wana jî ji hêla sazîya xwe ya net'ewî va polîêtnîk (p'ir'netew) e, û di wê da p'ir'anî jî êlêmêntên erebî ne. Dibe ku lewra jî ewana dibêjin, ku ew *êzîdî* ne, lê ne *k'urd* in!).

Û, li vira jî bersîva wê pirsê dertê holê, k'a çima di nava hemû gelên cîhanê da, yên ku di dema xwe da *zerdeştî* p'ejirandine, her t'enê di nava gelê *k'urd* da heya îro bi xwezayî mêla wan a berbi nirxên zerdeştîyê wisa zêndî maye. An jî, eger mirov bi şêwazekî veguhartî bîne zimên, dikare bibêje, ku *zerdeştî li bal k'urdên îroyîn t'omerêya dengveger'ên cîhana r'ewanî ya pêşîyan e* …

A, hema ev nirxên r'ewanî jî, yên ku ji bîrûbawerîya zerdeştîyê tên, di nava k'urdan da hatine p'arastin, û derfet dane wan, ku ew di wan derdoran da nîgara xwe ya net'ewî zêndî bip'arêzin, ên ku her tişt di nava xwe da hêrane û dabelandine.

Mirov dikare bibêje, ku zerdeştî r'ewşa k'urdan a r'ewanî û sewdayî a xwezayî ye, û ew di gelek waran da şêwazê têgihîştina wan a jîyanê dîyar dike. Lewra jî dagerkerên bîyanî ne bi şûr, ne bi sotin, ne bi wêranîyê, nikaribûne, r'ehên wê ji bîra wan û jiyana wan a r'ewanî bibir'in û t'une bikin...

Bala xwe bidinê, her çiqas, piştî wan r'êformên bi navê Şîxadî (Şêx Adî) va girêdayî, *êzdîtî* – ew bawerîya kevnar a xurû k'urdî, werguhêr'î *êzîdîtîyê* – terîqeta îslamê ya sofîyan jî kirine (bi erebî wisa jî – التصوف), û gelek bingehên êzdîtîyê hatine lêpovajîkirin, lê dîsa, heya di wê *êzîdîtîya* sofîyan da jî şopên zerdeştîyê hatine p'arastin. Mînak, di nava qewlên *êzîdîtîyê* da (ne yên *êzdîtîyê* da!) heya îro jî ew qewl hatine p'arastin, ên ku dîyarî ne ji bo Zerdeşt P'êxember. Û ewana jî, wek ku tê xuyan, di *êzdîtîya berî r'êformên Şîxadî* da hebûne.

Mînakên vî r'engî yên poêzîya *êzîdîtîyê* (dîsa ne yên *êzdîtîyê*!) ya r'ewanî li holê hene. Weha, hema du nimûne ji wana: "Qewlê Zerdeşt" û "Zerdeşt dibêje" (*Têmûrê Meso.* Newşe dînê êzîdîyan – 2020. – Rû. 902.–https://www.academia.edu/42054492/NEWŞE_DÎNÊ_ÊZÎDIYAN_ЕЗИДСКОЕ_СВЯЩЕНОСЛОВИЕ_THE_YEZIDI_HOLY_HYMNES û *Kovara* "Lalîş", № 15. – 2001. R'ûp'elên 13–14).

Lêbelê, bi demê r'a ew wisa werguhartine, ku di wê da zêdetir têgeh û ferzên doktrîna *êzîdîtîyê (yêzîdîzmê),* wek şaxekî *sofîtîya îslamê*, tên xuyan...

Wek mînak, em li vira her t'enê p'arç'eyekî bînin:

…Zerdeşt got: «Ya Xwedê tu xwedayî!
Tu layîqê medih û senayî,
Tu kesê bêkesa yî,
Tu mefera bê meferayî!...
Û ev jî hemû nîne!

Hem di nava k'urdên zaza da, hem jî di nava k'urdên êzdî da şaxên zarkî yên têk'sta helbestkî ya çermk'axeta (pêrgamênt//parşumen) Silêmanîyê ya sedsala VII hatine p'arastin, û di wê da şîna û mehêla wê malwêranîyê tê kirin, a ku bi êrîşên ereban r'a hatye serê ola zerdeştîyê!

Û ev têk'sta jî di dîroka wêjeya bi zimanên îranî тшмэыэ ya sedsalên navîn a berî îslamê îro bi sere xwe nimûneyeke t'enê ye. Ev p'arç'eyekî helbestekê ye, ya ku wek lûvandinekê (stranake şînê) ye, ji bo wê malwêranîyê, ya ku bi êrîşên ereban hatye serê ola zerdeştîyê!

Li ser vî p'arç'eyê ç'ermk'axetê, yê ku destpêka sedsala XX di şkevteke nêzîkî bajarê Silamanîyê (Başûrê Kurdistanê) da hatye dîtin, heyşt r'êzên helbesteke danerekî navê wî ne dyar hatine p'arastin, a ku bi tîpên aramêî hatibûye nivîsîn. Zanîyaran ew werguhêr'î tîpên erebî kirine, xwendine, û derketye holê, ku ew bi k'urdî hatye nivîsîn. Peyr'a di weşanên cuda da gotar û nivîsên zanistî di derbarê wê nivîsarê da hatine weşandin, di wan da wisa jî werger'ên wê hebûne. (Di vê derbarê da binihêr'e: *Акопов Г. Б.* Ещё о Сулейманийском пергаменте // Вестник общественных наук. – Ереван, 1968. – № 8. – С. 94–108; *Хамоян М. У.* О двух изустных вариантах текста сулейманийского пергамента VII века. – Труды Самаркандского государственного университета имени Алишера Навои. Новая серия, выпуск № 225. Вопросы фразеологии, стилистики и грамматического строя восточных языков. – Самарканд, 1972. – С. 82–89.).

Û îro êdî di weşanên cuda da mirov dikare nimûneyên cuda yên werger'a wê peykera nivîskî ya sedsala VII bibîne… Lêbelê, li ser bingeha wergerên r'êzkî yên cuda min ew têk'sta helbestkî anegorî kurmancîya îro jinûva vesazand, û, weha, bi nêzîke, nave'roka wê ev e:

*P'erestgehên Hurmuz wêran kirine,*
*agirên wan kuştine (vemirandine),*
*Wisa li me kirin wan gewrên gewran,*
*Erebên zorkar (cîhan) li me kirin tarî,*
*Gundên (herêma) P'alê ta Şahrêzûrê,*
*Jin û keç'ikan wê dîl bişînin,*
*R'eha mêran wê binva bibir'in,*
*Bawerîya Zerdeşt maye bê xwedî,*
*Alîk'ar nabin Hurmuz û hîç kes…*

Wek ku tê xuyan, di vê têk'stê da ne ku t'enê di derbarê bûyerên bobelatjen (trajîk) ên sedsala VII da tê vegotin, ên ku bi êrîşên ereban r'a di ser K'urdistanê û Îranê da hatine, lê, her weha ji bo wê r'ewşa bêç'are dilûvîne, ya ku hatye serê bawerîya Zerdeşt.

Û ya here balk'êş ew e, ku *şaxên zarkî yên vê lûvandina (strana şînê) ji bo r'ewşa bawerîya Zeredeşt di nava k'urdên zaza û yên êzdî da hatine p'arastin.*

Dîrokzanê k'urd Nûrî Dêrsimî di p'irtûka xwe ya "Dêrsim di dîroka K'urdistanê da" di vê derbarê da agahîyên balk'êş tîne. Ew dinivîse: *"... Ji sala 90î ya hîcrî va, wan art'êşên erebî-îslamî, yên ku êrîş birin ser r'ojhilat û bakur, li r'ojhilatê Anatolîyayê dawî li desthilatdariya Îranê û ya gelên îranî anîn û di dawiyê da gelê Dêrsimê jî di sala mîladî ya 669an de ji bin destê r'ûman k'etin bin destê ereban.*

*K'urdên Dêrsimê li dijî ereban li ber xwe dan û nebûne musulman, ola xwe ya zerdeştî domandin û p'arastin. R'êvebiriya ereban li ser Dêrsimê bandor nekiriye, lê herêmên dinê yên K'urdistanê bi darê zorê ji neç'arîyê îslamiyet p'ejirandine.*

*Heya van demên dawîyê jî di nava k'urdên zazaa da li ser mirîyan ev gotinana wek şîwan dihatin nivatin:*

*Hurmuzgan r'uman*

*At'iran kujan*
*Hoşan şarewe gevre gevregan*
*Zork'ari arep k'irdine Habur*
*Gihane pala paşe Şarizor*

*Jin u kenikan ve dil beşinan*
*Merdi aza dilên ji ruye hevnan*
*R'aveştê Zerdeşt maye bêdest*
*Bizika na kit Hurmuz ve hiç kes.*
*Sal – 669"*

(*Nuri Dersimi:* "Kurdistan tarihinde Dersim". Halep, 1952, s.: 22 – 23 ve 130//*Nûrî Dêrsimî*: "Dêrsim di dîroka K'urdistanê da". Heleb, 1952, r'û.: 22 – 23 û 130)**.**

Dibe ku, li vira hîç pêdivî bi şiroveyan nîne jî, tiştek li ber ç'avan e: şaxê *têksta çermkaxeta Silêmanîyê ya sedsala VII* di nava k'urdên zaza da zêndî maye.

Û ya ku hêjayî baldarîya t'aybet e jî, hema ev e!

Lêbelê ev jî hemû nîne. Wisa jî balk'êş e, ku şaxekî zarkî yê vê şîwanê bi demê r'a wisa jî di Ermenîstana Sovêtî da p'eyda bûye. Lê şaxekî dinê hê berî wê di heman Ermenîstana Sovêtî da êdî di nava nûnerên civaka k'urdên êzdî da hatye dîtin.

Weha, sala 1968-an zimanzanê k'urd Mak'sîmê Xemo ji ber zarê nivîsk'arê kurd ê navdar Erebê Şemo şaxê têk'sta navborî girtye û nivîsye:

*"Li me hatin ereban,*
*Li me kirin gewrî gewran,*
*Birin zar', jin û qîz,*
*Ew gewrî gewran welat li me kirin wêran".*

Û piştî salekê, sala 1969-an heman Mak'sîmê Xemo şaxekî dinê yê têk'sta navborî jî, vê care ji zarê Tîgranê Zaza (Poxosyan), dinivîse. Tîgran niştecîyê demekê yê gundê P'îranê (naha Lûçna yê navçeya Baharmadan a herêma Amedê ye, di Bakûrê Kurdistanê da) û wê demê di bajarê Abovyan ê Ermenîstana Sovêtê da jîyaye. Ew di nava k'urdên zaza da mezin bibûye. Û di nava van da jî, wek ku Nûrî Dêrsimî dinivîse: *"Heya van demên dawîyê jî ... li ser mirîyan ev gotinana wek şîwan dihatin nivatin".*

Weha, ew şaxê zarkî yê têksta ç'ermk'axeta Silamanîyê ya sedsala VII:

*"Hormozgan r'îman adiryan kêşyan,*
*Wisan serdawa gewrî gewran,*
*Zorkar arap k'irdine zapûr*
*Gune pale t'aha Şeherazûr,*
*Jinan-k'enîkan vê dîl bêşîne*
*merd azat le vê r'uî hîna,*
*bêcihra nahîka Hormoz".*

Balk'êş e, ne!? Şaxê zarkî yê nivîsara (têk'st) sedsala VII ser p'arç'eyê ç'ermk'axetê nivîsî, yê ku sala 1920-î li derdorên bajarê Silêmanîyê hatibûye dîtin, di nava k'urdên zaza da ger'yaye, ew di şîna mirîyan da wek şîwan lûvandine. Şaxên zarkî yên cuda yên heman nivîsarê di nava k'urdên dinê da jî hatine p'arastin û bi k'urdên êzdî r'a hatine gihîştine Ermenîstana Sovêtî. – Bala xwe bidin goveka erdnîgarî ya belavbûna wan şaxên zarkî: *herêma Soran a Başûrê Kurdistanê – Amed, Dêrsim û Serhed li Bakûrê Kurdistanê – Ermenîstan*! Û ev her t'enê ew herêmên K'urdistanê ne, yên ku agahîyên me ji wir hene,

Ya balk'êş ew e, ku hinek bawerîyên k'urdistanî (yên wek *êzdtîyê*!) heya r'adeyekê dikaribûne xwe bip'arêzin, beşê herî mezin ê gelê k'urd di bin metirsîya t'unekirina fîzîkî da îslam p'ejirandye, lê di herêmên K'urdistanê yên cuda da k'urdan ber xwe dane (wek ku di *Dêrsimê* da!). Lêbelê zerdeştî ji bo hemû k'urdan jî nirxê r'ewanî yê giştî maye û faktora yekêtêyê ye, û hemû, her yek bi şêweyê xwe, t'îbûna xwe ya r'ewanî di wê da şkênandine.

Ew, ku di nava *êzdîyan* da qewlên dîyarî Zerdeşt P'êxember hene, û wisa jî şaxên zarkî yên nvîsara sedsala VII a ç'ermk'axeta Silêmanîyê di nava k'urdên zaza û yên êzdî da hatine p'arastin, ev govenîya wê yekê ye, ku *zerdeştî*, wek ol, ne ku t'enê di Medya kevnar da li ser bingeha wan bawerîyên gelêrî, yên ku berî wê hebûne, pêk hatye û t'ewşe (şêwaz) girtye, lê wisa jî bi *bawerîyên xwezayp'erest* r'a t'evayî di nava gelê k'urd da belav bûye. Û, her çqas, êrîşên t'unek'ar ên *Alêk'sandrê Makêdonî* û hê derng cerd û zevtk'arîyên (êk'spansîya) erebî-îslamî p'ir' wêrankar bûne, piştî wana her t'enê xak û herêmên xalî mane, lê, yek e, şopên zerdeştîyê heya naha jî di nava gel da zêndî dimînin.

**– Di p'irtûka We da wisa jî tê gotin, ku gelek agahîyên di derbarê jîyana Zerdeşt P'êxember da hatine lêpovajîkirin. Yek ji wana jî di derbarê têkilîyên bi binemala *haxemenîyan* da ye. Gelo bi r'astî Zerdeşt P'êxember têk'ilîyên xwe bi *haxemenîyan* r'a hebûye? An ew ji hêla *dîroknûsên fars* va hatye hinartin?**

– Eger mirov bi kurtî bibêje, hîç p'êwendîyeke wan, ewên ku wek *haxemenî* tên navkirin, bi *Zerdeşt P'êxember* r'a nîne, lewra ku, dema bi r'êya derbeya hindur'în a qesrê Qurûşê (ê II ê dihatûyê) t'or'inê Îştûvêgûyê (Astîagês) p'adişahê Medyayê desthilata welêt zevt dike, Zerdeşt P'êxember wê demê êdî zêndî nînbûye: ewî sala 551-ê ya b.z., mala xwe ji cîhana r'onik bar kiribûye, û derbeya qesrî jî, her salêkê pişt r'a, sala 550-î ya b.z. pêk hatye,

Lê ew t'evlîhevîya di dîroka gelê k'urd a serdemên kevnar û sedsalên navîn da, û, bi t'aybet jî, di derbarê pêkhatina ola zerdeştîyê, jîyana Zerdeşt P'êxember bi xwe û erk'a wî ya peyamdarîya bawerîyê da, encama k'arên r'eş ên ç'îrokbêj û lêpok'arên (sextek'ar) fars ên derdorê qesrê bûye. Û ya ku mirov matma dike jî, ew e, ku dîrokzan û dîroknûsên cîhana mayîn, dema di derbarê dîroka wê serdemê da nivîsîne û îro jî dinivîsin, wan hemû efsane (mît) û ç'îrokên dûrî heş û sewdayê mirovê t'endurusst ji xwe r'a wek bigeh hiltînin, ên ku lêpok'arên dîrokê yên qesrê hinartine.

Lêbelê, divê ew r'astî jî neyê ji bîrkirin, ku di dîrokê da hîç tiştek bê şop winda nabe! Û hîç ji kesekî r'a li hev nehatye, ku vê r'astîyê betal bike.

Lê, dîsa jî, ev êdî derdorê dused salan e, zanîyar û lêger'îner di derbarê welatê Zerdeşt P'êxember û herêma destpêkî ya belavbûna bîrûbawerîya wî da govtûgo û gengeşîyan pêk tînin, lê hê jî negihîştine nêr'îneke hevbeş….

Pirs dertê holê – çima?

Ew ji ber wê ye, ku li ser bingeha wan hemû ç'îrok û efsaneyên dûrî heş û sewdayê tendurust, yên ku ji hêla ç'îrokbêjên derewîn va hatine hinartin, mirov nikare lêger'înên zanistî pêk bîne, r'astîyê û lêpîyê ji hev vebijêre û r'astîya dîrokî derîne r'onahîyê.

Û, lewra jî, piştî gengeşîyên demdirêj di cîhana zanistê da *hatine ser wê nêr'înê*, ku agahêyên jînenîgarîya *Zerdeşt P'êxember* p'ir' kêm in, bi nak'okî ne û bawerî bi wan nine, û, bi wî awahî, dawî bi wê pirsê anîne. Bi vî awahî ewana li hember lêpok'arên dîrokê bêhêzî û bêç'aretîya xwe ya zanistî dane xuyan.

Lêbelê, bi dîtina hinek zanîyaran, û ew jî ne bê bingeh e, dîsa jî, di agahîyên heyî da tiştê ku mirov bikaribe r'astîyê jê derîne, heye: *eger Zerdeşt P'êxember Avêsta piştî serdema r'êvebirîya hexamenîyan nivîsîbûya (ango, piştî sala 550-î ya b. z.), wê demê dê di P'irtûka Pîroz (Avêsta) da di derbarê desthilatdarên wê binemalê da jî agahî hebûna.*

Û li dora vê pirsê ewqas nêr'în, pêşdîtin û r'eşbazarîyên (spêkûlatsîon) cihêr'eng ên bi nak'ok û dijberî hev berevbûne, û r'ewş ewqasî li hev piç'ikye, ku di destpêkê da min nizanibû lêger'ênên xwe ji k'u destpê bikim.

Bi r'astî, li ber mirov dîmenek vedibe, qey bibêjî, hinekan bi zanebûn agahî û daneyên dîrokî wisa li hev guhar'tine, ew t'evlihev kirine, ew wisa lêpovajî kirine, ku mirov nikaribe xwe bigihîne r'astîyê.

Lêbelê, eger mirov hesab hilde, ku cîhan û dîrok bi Îranê (Farsistanê) bi sînor nabin, û bi berfirehtir li pêvajoyên dîrokî binihêr'e, dê bikaribe gelek agahîyên dîrokî yên serdemên cuda di derbarê vê herêmê da bibîne. Ma ne, li hawirdorê gel û dewletên dinê jî hebûne – yên gewre û biç'ûk. Û ewana di dîroknûsîya cîhanê da şopeke berbiç'av hiştine. Di peykerên nivîskî yên gelên herêmê da agahîyên balk'êş hatine p'arastin. Beşek ji wan ç'avkanîyan hatine lêger'andin, yên mayîn benda dema xwe ne. Û heya îro jî di destnivîsarên kevnar da mirov dikare agahîyên wisa bibîne, yên ku di dema xwe da an *"nehatine dîtin"*, an jî hema wisa ew bê baldarî hiştine.

Û, lewra jî, ji bo ku bikaribim serederîyê ji van hemû *pêşdîtinan, delîlbêjîyan, cudaşêwazîyan û nêr'înan* bikim, min bir'yar kir, di sêrî da dyar bikim, k'a konkrêt çi li ber destê me heye, û her paşê wan hemûyan di nava hev da serûber bikim û binirxînim.

Weha, di derbarê *Zerdeşt P'êxember* da dinivîsin, xwedêgiravî:

– Di *Gatan* da ne di derbarê welatê *Zerdeşt* da, ne jî di derbarê welatê *Kavî Vîştaspa* da agahî nînin, lewra ku ewan mirovana, yên ku *Gat* guhdar kirine, dizanibûne, k'a ew çi welat e, ji bo wê jî pêdivî nînbûye, navê wî binivîsin...

– ew li ser erd û aqarên *Baktrîya dîrokî*, li derdorên bajarê *Balxê* (li *Afxanistana* îro) hatye cîhanê;

– ew di *Radêsê* da jêyaye (per'ê T'ehrana îroyîn ê bi nave *Ray*)...;

– ew li r'ojhilatê *Îrana Mezin* ji dêya xwe bûye (dewrên VI – V ên b.z.);

– ew di *Îrana kevnar* da jîyaye, … an jî di *Asîya Navîn* da, ji *derya Aralê* berbi bakûr-r'ojhilat va – li ser xakên Qazaxistan û Tacîkistana îroyîn…;

– ew li deverên derdorê ç'îyayên *Ûralê* hatye cîhanê; û heya hinek kes navên k'ilafeyên (xerabe) kevnebajarên *Sîntaşta* û *Arkaîmê* yên di herêma Çêlyabînskê ya Fêdêrat'sîona R'ûsîyayê da jî tînin...;

Wisa jî tê gotin, xwedêgiravî:

–mirov nikare bibêje, k'a *Zerdeşt* li k'u û k'engê hatye cîhanê û erka xwe ya *p'êxemberîyê* pêk anye;

–*Zerdeşt* bîrûbawerîya xwe di hinek herêmên r'ojhilatê *Îranê* da, di *Asîya Navîn* û *Afxanistanê* da belav kirye;

– padişahê *Baktrîyayê* (?! – E. C.) yê bi navê *Goştasp/Vîştaspa* li wî xwedî derk'etye û bi xwe jî destek daye k'arê belavkirina zerdeştîyê…;

– dema *Zerdeşt* wek p'enaberekî bê cî û war û bê star di herêmên bakûrê dewleta farsan da ger'yaye, ewî serdarê herêmê yê bi navê *Vîştaspa* anye ser bawerîya xwe…;

…Her çiqas di van nêr'înan da nakokî hene, dîsa jî di wan da agahîyên balk'êş veşartî ne; û, her çiqas, ew agahîyana daneyên konkrêt destnîşan nakin jî, lê nepêkanetîya agahîyên heyî bi xwe derdixin hole...

Ji van nêr'înan, ên ku hatine vegotin, mirov dikare van xalên hanê cuda bike:

– … Di *Avêstayê* da hinek agahî hene, yên ku dikaribûn ji hêla destnîşankirina demê va xwedî wat'e bin. Mînak, *t'or'a gênêologî*... Lêbelê tê gotin, ku ji hêla bawerdarîyê va ev agahî bi guman e;

– … Di *Avêstayê* da di derbarê hîç desthilatdarekî ji binemala hexamenîyan da jî agahî nînin, ên ku ji sala 550-î ya b.z. va r'êvabirî li welêt kirine...

Li ber ç'avan e, ku di van nêr'în, dîtin û şaxên serpêhatîyan da hîç tiştekî t'omerî-giştî nine, yê ku wana bigihîne hev, û, eger mirov pêbawerîya yekê ji wan bip'ejirîne, ewê bê wat'eya r'edkirina yên dinê. Lewra jî dê ne r'ast be, eger mirov ewana di nava govekeke giştî da binirxîne.

Hem jî pirs ji ber wê dijwartir dibe, ku hema-hema hemû zanîyar jî lêger'înên xwe li ser bingeha hinek agahîyên şêwazî (formal) pêk tînin, ên ku ne ç'avkanîyên wana dyar in, ne jî motîvên peydabûna wan, û pirsa pêbawerîya wana bi guman e.

Û, eger mirov bi vî awayî pirsê binirxîne, wê demê heşmendîya pêşk'etinên bûyerên

dîrokî yên wê demê dê li paşva vek'işin û derbazî ser plana duyem bibe…

Û lewra jî, li vira pêdivî derk'et holê, ku ez hewl bidim, dîmenê pêşveçûnên bûyerên dîrokî yên xwezayî vesazînim (*reconstruction*), û bi wî awahî, bi r'êya analîza hemberhevkirinî ya daneyên dîrokî yên di derbarê bûyerên wê serdemê da, ji bo lêger'înên daneyên diroka r'êal a jîyana *Zerdeşt P'êxember* r'ê û r'êbazên r'ast bibînim.

Di derbarê vê pirsê da li bal r'ojilatzanê sovêtî-r'ûsîyayî yê navdar Î. M. Dyakonov dîtinên p'ir' balk'êş hene, yên ku dikaribûn gelek t'erefên vê pirsê r'onî bikirana. Weha, ew vê pirsgirêkê çawa dibîne: *"... Heya naha di wê derbarê da, k'a gelo ew peyker [Avêsta] di Medyayê da hatye nivîsîn, an di devereke Asîya Navîn da, gengeşî hene. Herdû nêr'în jî, hem di nav zanîyarên sovêtî, hem jî di nav yên welatên dinê da t'erefdarên xwe hene.*

*Wisa jî pirsa dema nivîsîna beşên kevnar ên Avêstayê bê bersîv dimîne. Hinek lêger'îner dibêjin, ku Zerdeşt (Zoroastr)... hevdemîyê Vîştaspê I (salên 522 – 485 ên b.z. m.) ê bavê Darîûsê padşahê farsan e. ...Hinek lêger'înerên dinê pêkhatina kevnartirîn beşên Avêstayê digihîninn demên bêhtir kevn..."* (*Дьяконов И. М.*, История Мидии, М. – Л., 1956 // *Dyakonov. Î. M*. "Dîroka Medyayê", M. –L., 1956, r'û. 50).

Divê bibêjim, piştî vê agahîyê r'ewşeke ne sade derket holê.

Lêbelê min bir'yar da, bi r'êyeke dinê herim. Min ew r'ê hilbijart, ya ku di pêkanîna analîza agahîyan a zanistî-r'exneyî r'a derbaz dibe. Jixwe ew agahî jî di ç'avkanîyên kevnar û yên sedsalên navîn da hatine p'arastin. Û di encama analîzan da derk'et hole, ku ew hemû "r'awêj" û "t'exmînana" ne anegorî heşmendîya pêşk'evtinên pêvajoyên dîrokî yên xwezayî ne, û bi hîç awayekî ew û dîmenê giştî yê pêvajoyên dîrokî yên wê serdemê li hev nagirin.

Dema mirov van hemû nêr'în, pêşdîtin û şaxên serpêhatîyan dinihêr'e, bêyî r'ayê wî di serê wî da pirsek r'û dide: *"Ew çawa dikaribû, wisa bibûya, ku di dewra dewra VI a b.z. mirovek ji p'er'ê r'ojhilatê yê dewleta hexamenîyan (ji Qazaxistan, Tacîkistan an Afxanistana îroyîn) here-bigihîje "navçeyên bakûrî" yên wê dewletê, r'astî serdarê "wê deverê" bê, wî bîne ser bawerîya xwe, û peyr'a bi alîk'arî û pişgirîya wî, bîrûbawerîya xwe di t'evahîya Îrana mezin da belav bike?"*

Û dibe ku Hûn bibêjin, ku tiştên weha her t'enê dikaribûn di ç'îr'okên sedsalên navîn da pêk bihatana!

Û hûnê mafdar bin!

Ma ne, ol ne pêdivîyeke navmalê ye (xalî-xalîçe, p'arç'e an tiştên dinê yên r'ojhilatî), ku mirov bikaribûya ew li ser pişta deveyan, bi *r'êya hermûş* r'a ji p'er'ekî dewleta gewre bibira bigîhanda p'er'ê dinê, û bifirota.

Ma ne, ol şêwazekî t'aybet ê hizir û bîrewarîya civakî ye û hebûna wê bi t'omerîya hinek norm, dua-dirozge, bawerî, r'ê û r'izmên olî û hevgirtin û kombûna mirovan di civaka olî da dikare hebe... Û, ger mirov zimanê civakekê û r'abûn-r'ûniştin û kevneşopîyên wê nizanibe, gelo dê bikaribe (*heya bi t'êorêtîkî*) wan hemûyan di jîyanê da pêk bîne? Û, ew jî, di nîveka hezarsala yekem a berî serdema me da!

Û, pirseke dinê ya ne kêm girîng jî: gelo, serdarê herêmê (ew p'adişah be, an satrap, zêde ne girîng e!) çawa wisa bi hêsane derîyê mala xwe li ber p'enaberekî bê cî û st'ar vedike, ji wî r'a dostanîyê datîne, û li wî xwedî derdik'eve, piştovanîya wî dike? Ma, gelo wê dema (lo, hema îro jî!), p'enaberên bê cî û war, ger'okên sergedan dikaribûn wisa bi hêsane heya nêzîkî qesra p'adşê bibûna? Jixwe, heya nikare bê ber heşê mirov jî, ku wê demê ewî p'enaberî heya bikaribûya derbazî hundur'ê hewşa p'adişêh jî bibûya?

Eger mirov anegorî wan delîlên li jorê li wan dîtin, nêr'în û şaxên serpêhatyan binihêr'e û wan binirxîne, ew hemû dê wek holimaç'kên zar'okan ên bi hişkek'axezê (karton) çêkirî yek bi yek li dû hev li ser hevdu da hilweşin, ...lewra ku, ew hemû hema di sêrî da li ser agahîyên bi sunî hinartî an jî daneyên lêpovajîkirî hatine avakirin, ên ku hinekan ji bo girseyên wê serdemê (dewra VI a b.z.) ji ber xwe derxistine.

Eger em bibêjin, ku têk'nolojîyên siyasî yên gemar t'enê di dîroka nû û nûtirîn da hebûne, emê heya dawîyê şaş bin. Lêpovajîkirina agahîyên dîrokî û p'evguhar'tina daneyan hê di dema p'eydabûna dewleta yekem da hatine bik'aranîn… Û hê di k'ûrahîya dîroka kevnar da ewana ji hêla dewletên konkrêt, an jî ji hêla wan kes û hêzan va, hatine bik'aranîn, ên ku li ser r'êya damezirandina dewleta xwe bûne.

Ez bi bawer bûm, ji bo ku mirov bikaribe lêger'înên dîroka serdemekê ya welatekî an net'eweke konkrêt pêk bîne, ew divê pêvajoyên pêşveçûna wê serdemê bi r'êalî bîne ber ç'avên xwe. Û, ji bo ku ew lêger'în, ên ku pêk tên, obyêtîv bin, mercê herî pêwîst ew e, ku mirov bi helwesteke zanistî-r'exneyî nêzîkî nirxandina qinyatên (matêrîalên) dîrokî bibe.

Lê pe'vguhar'tina daneyan û lêpovajîkirina zanîyarîyên dîrokî jî di wê herêmê da hê wê demê dest pê bûne, dema *Quruş* (*ê II* ê dihatûyê) di Medyayê da bi derbeya hindur'în a xayînane desthilatê hiltîne destê xwe. Jixwe, wek ku tê zanîn, Qurûş lawê satrapê fars û t'orinê *Îştûvêgû/Astîagêsê* p'adişahê *Medyayê* bûye. Ew malmezin û giregirên bijarte yên ner'azî, dilmayî, xeyîdî û nedilsoz li dijî kalikê xwe t'evger dike, û şer'ekî k'irêt li dijî wî dadixe (sala 550î ya b.z.), bi xayîntî wî ji ser t'ext diavêje, û di welêt da desthilaatdarîyê hiltîne destê xwe. (*Альберт Олмстед*, «История персидской империи», Москва, 2012 // *Albêrt Olmstêd*, "Dîroka Împêratorîya farsan", Moskova, 2012, r'û. 36 – 38; *Дьяконов И. М.,* История Мидии, М. – Л., 1956 //*Dyakonov. Î. M.*"Dîroka Medyayê", Moskova –Lênîngrad, 1956, r'û. 413 – 424; Энциклопедический Словарь *Ф. А. Брокгауза и И. А. Ефрона*, СПб, 1890 – 1907//Ferhenga êntsîklopêdî ya *Brokhaûz û Yêfron*, Sankt-Pêtêrbûrg, 1890 – 1907, XIX, r'û. 238 – 239; *Опарин А. А.*, Всемирная история и пророчества Библии, Харьков, 1997//*Oparîn A. A.,*"Dîroka hemcîhanî û gotinên pêxemberane yên Êncîlê", Xarkov, 1997, r'û. 54 – 58; *Ezîz ê Cewo*, "Êzdîtî: Divê mirov rastîya wê li ku bigere?", Amed-2017, r'û. 68 – 94; û **Wik**.).

Ji talebextan r'a, dema zanîyaran di warê dîroka gelên herêma erdnîgarî a berfireh a bi navê Îran da lêger'în pêk anîne, di bin destê wan da t'enê agahîyên ç'avkanîyên farsan hebûne (yên hexamenîyan, sasanîyan, p'ert'ewîyan û yên dinê), û beşê wan ê mezin jî li ser bingeha berhemên cihêr'eng ên zargotna gelêrî hatibûne nivîsîn, û lewra jî, p'ir'ê caran gelek daneyên r'astîn ên dîrokî derî bala wan mane, û lêger'înên wana berovajî heşmendîya pêşveçûna xwezayî ya bûyerên dîrokî hatine û îro jî tên pêkanîn.

Ev r'êbaza (mêtod) bûye prênsîpa *"zanistî"* ya dîroknûsîya fermî ya dewletên *farsan, tirkan û hinek welatên dinê yên ereban*, a ku heya gelek caran r'êbaz û armancên siyaseta evan dewletana jî dyar dike.

Gelek nimûneyên *afrandinên "gelêrî"* yên vî r'engî yên *farsan* (wisa jî yên *ereb* û *t'irkan*) ji hêla hinek kesan va hatine nivîsîn, ên ku bi hinartina *"zanista" dîrokî* ya wan welatan va mijûl bûne. Û lêger'înên *"zanistî"* yên weke ewên navborî di dema xwe da ji bo dîroknûsîya fermî ya wan dewletan bûne bingeh. Di van welatan da bi hêsane agahîyên dîrokî lêpovajî dikin, daneyan diguhêr'in, mîrasa çandî û dîrokî ya gelên dinê li ser xwe dinivîsin û, bi vî awayî, dîroka xwe li ser r'edkirin û t'unekirina dîroka gel û net'ewên herêmê ava dikin…

Her çiqas her tişt bê şop winda nebûye jî, lêbelê, li ber ç'avan e, ku ew "agahî", yên ku ji hêla lêpok'aran (sextek'aran) va hatibûne lêpovajîkirin, paşê, hê dereng, gelek dîrokzanên welatên dinê jî ew agahîyana ji bo lêger'înên xwe kirine bingeh, lewra ku ewana bi xwe jî nûnerên zanista fermî ya welatên xwe bûne.

Û lewra jî, min lêger'înên sersedemên cudaxwendina jînenîgarîya Zerdeşt P'êxember ji vê hêlê va destpêkir.

Ew lêger'în dijwar bûn, lê ewana hewldanên min bê encam nehîştin.

Di pêvajoya lêger'înên dîroka jîyana *Zerdeşt P'êxember* û pêkanîna erk'darîya wî ya danasîn û belavkirina bîrûbawerîya nû da min pêkanîna erk'ekê li ber xwe danî, ku ez r'astîya bûyerên dîrokî yên r'êal bi zanistî vejinînim, û wan û ç'îr'okên hinartî ji hev

vebijêrim. Û ji bo vê divê min hewl bida, bersîva van du pirsan bidim:

1. Çawa dikaribû bibûya, ku *Zerdeşt P'êxember* r'astî du serdaran bihata, yên ku di serdemên dîrokî yên cuda da jîyane (û navê herduyan jî – Vîştaspa!), û, xwedêgiravî, dema ku *P'êxember* erk'a xwe ya *p'eyamdarîya* ***bawerîyê (şorinbêjîyê)*** pêk anye, ewana li wî xwedî derk'etine?

2. Û, gelo ev çiqasî anegorî heşmendîya pêşk'evtina pêvajoyên dîrokî, pêwendîyên civakî û demnûsîya (k'ronologîya) wê serdemê ye?

Ji bo ku bersîva van pirsan bibînim, ez carake dinê li wê pirsê veger'yam, ku di şaxên cuda yên "jînenîgarîya" *Zerdeşt P'êxember* da navên du serdaran derbaz dibin, û navên herduyan jî *Vîştaspa* ye. Û, anegorî wan "jînenîgarîyan", yek ji wana *"padişahê"* Baktrîyayê bûye, ya ku li r'ojhilatê dewleta gewre ya "hexemenîyan" bûye, lê yê dinê serdarê (hukumdar) *"herêmên heman dewletê yên milê bakûr"* bûye.

Hinek lêger'îner hewl didin bipeytînin (îzbat bikin), xwedêgiravî, yê ku li Zerdeşt P'êxember xwedî derketye, *Gîstaspê (Vîştaspa) serdarê Baktrîyayê* bûye, lê yên dinê – *Vîştaspayê* serdarê herêmên bakûr.

Ji bo ku min bikaribûya bi r'awêjî (hîpotêtîkî) dyar bikim, k'a ji wan serdaran k'îjanî dikaribûye li *Zerdeşt P'êxember* xwedî derk'etibe, pêwîst bû, zelal bikim, k'a ji wan hîpotêzan k'îjan anegorî r'astîyên dîrokî yên wê serdemê ye.

Wê demê min digot, eger ji min r'a li hev bê, ji bo vê pirsê bersîva r'ast bibînim, wê demê ezê bikaribim li ser r'êya dyarkirina warê pêkanîna erk'a *Zerdeşt* a p'eyamdarîya bawerуê û herêma destpêkê ya belavkirina zerdeştîyê gava xwe ya *yekem* a *r'êal* biavêjim, û hema bi wê jî, dibe ku, cîyê jidayîkbûna Wî bibînim.

Û ji bo vê jî min lêger'înên xwe ji cudaşêwazên (vêrsîon) di derbarê Gîstaspê (Vîştaspa) serdarê Baktrîyayê destpê kirin.

Weha, di derbarê wî da tê gotin, ku, piştî wê, dema sala 465-an a berî serdema me di encama delk' û dolabên qesrî da *Xşayarşa*/خشايارشا (*Ksêrks*) ê p'adşahê farsan û *Darîûşê* (داريوش) nuxurîyê wî tên kuştin, lawê wî yê dinê, *Erdeşîr*/اردشير (*Artaksêrks*), yê ku di dîrokê da wek *Erdeşîrê I* tê zanîn, tê ser t'ext. … Wisa jî tê zanîn, ku *Erdeşîr* di p'evçûna di qesrê da *Artabanê* serokê parastina *padşêh* û *Aspamîtrayê* serekê hrema wî dikuje. Sala 464-an a b.z. *Gûştaspê* (*Vîştaspa*) birayê Erdeşîr, satrapê (walî) Baktrîyayê li dijî wî r'adibe serhildanê, têk diçe û tê kuştin. Piştî vê, ji metirsîya derbeya hindur'în (ya qesrê), bi fermana Erdeşîr birayên wî yên dinê jî dikujin…

Li vira ya balk'êş ew e, ku berî van bûyeran jî dîrokeke vê malbetê ya bexter'eş hebûye: di dema xwe da (s. 478 a b.z.) *Xşayarşayê* bavê wana (*Ksêrks*) jî bi heman r'êbazê li hember Masîstayê birayê xwe t'evgeryaye. Wê demê Masîsta jî satrapê Baktrîyê bûye, û ewî jî hewl daye, li dijî birayê xwe serî hilde û hatye kuştin…

Erê-ê-ê, bi r'astî jî, binemala p'adişêh bextr'eş bûye, dîroka wan dîrokeke xwînrêjîyê bûye, ew bi xiyanet, delk' û dolab, derbe û kuştinan va t'uje bûye!

Û li vira pirs dertê hole: *"Ma, di r'ewşeke weha da, dema di qesrê da û li derdorên wê hemû amade bûne, û her ç'avê wan li demê bûye, k'a çawa hev t'une bikin, gelo yekî ji wan dê bikaribûya dilovanîyê û xêrxwazêyê pêk bîne û heya piştovanîya mirovekî nenas bike, yê ku erk'a* ***p'eyamdarîya oleke ne nas*** *pêk tîne, û heya amade be, ji bo wê alîk'arîyê bide wî, ku ew wê ola bîyanî di nava gel da belav bike? – Ew jî wê demê, dema Gûştasp (Vîştaspa) bi xwe ne ku p'adişah, lê her t'enê satrapek(walî) bûye, ew jî di demeke p'ir' kurt da!"* – Li ber ç'avan e, ku heşmendîya pêkhatinêna bûyeran û daneyên dîrokî ç'îr'oka di wê derbarê da, xwedêgiravî, *Gîstaspê* satrapê Baktrîyê (Vîştaspa) li *Zerdeşt P'êxember* xwedî derk'etye, piştrast nakin.

Ji bilî vê, wisa jî dane û bûyerên dinê hene, yên ku li dijî vê nêr'înê ne: tê zanîn, ku navê hîç serdarekî ji binemala hexamenîyan di *Avêstayê* da nayê bîranîn, yên ku piştî sala 550-î ya b.z. di welêt da desthilatdar bûne. Ango, *Zerdeşt P'êxember* berî serdema

hexamenîyan jîyaye û erk'a xwe ya peyamdarîya olî pêk anye û nikaribûye r'astî wî satrapî bê, yê ku bira û hevdemîyê *Erdeşîrê I* (*Artaksêrksê I*) bûye. Û *Erdeşîr* jî (s. 464 – 425 ên b.z.), wek ku tê zanîn, di navnîşa p'adişahên hexamenîyan da yê şeşem bûye... (*Дьяконов И. М.,* История Мидии, М. – Л., 1956 //*Dyakonov. Î. M.*"Dîroka Medyayê", Moskova – Lênîngrad, 1956., r'û.47 – 54; Энциклопедический Словарь *Ф. А. Брокгауза и И. А. Ефрона,* СПб, 1890 – 1907 //Ferhenga êntsîklopêdî ya *Brokhaûz û Yêfron*, Sankt-Pêtêrbûrg, 1890 – 1907, berg 22[A], r'û. 881 – 884; *Опарин А. А.,* Всемирная история и пророчества Библии, Харьков, 1997//*Oparîn A. A.*, "Dîroka hemcîhanî û gotinên pêxemberane yên Êncîlê", Xarkov, 1997, r'û. 56.).

Paşê, ji bilî van hemûyan, hê zanîyar-êntsîklopêdîst û bîrewarê fars ê sedsalên navîn el-Bîrûnî (973 – 1048), li ser bingeha k'ronologîya kevneşopî ya p'ehlewî hatye ser wê dîtine, ku *Zerdeşt P'êxember* 258 salan berî êrîşa *Alêk'sandrê Makêdonî* (Îskender) ya ser Îranê jîyaye. (*Ричард Фрай.* Наследие Ирана. – М., 1972. – С. 52 // *R'îçard Fray*, "Mîrasa Îranê", Moskova, 1972, r'û. 52). Ango, eger mirov jimara 258 li 330-î (sala dagerkirina Împêratorîya Med û Farsan ji hêla Alêk'sandrê Makêdonî va) zêde bike, wê demê dê sala 588-an a b.z. derê holê. Ango, bi hejmartina *Bîrûnî*, *Zerdeşt P'êxember* derdorê 40 salî berî derbeya hindur'în û p'eydabûna hexemanîyan jîyaye. Lê îranîstê amêrîkî *Rîçard Fray*, ji bo ku bibîne, k'a dema *Zerdeşt P'êxember Vîştaspayê* p'adişayê *Medyayê* anye ser bawerîya xwe, çendsalî bûye, dane û agahîyên cuda yên dîrokî analîz dike, bi awayekî p'ir' balk'êş salên t'emenê wî yên wê demê dihejmêre û li ser wê bingehê nêr'în û dîtinênn heşmendî derdixe pêş. Ew dinivîse: *"... Divê mirov ji bîr neke, ku sala 588-an a berî serdema me, ya ku dikaribû anegorî wê demê bûya, gava Vîştspa bîrûbawerîya Zerdeşt p'ejirandye (wek ku gihîştye me, ew wê demê 42salî bûye)... Anegorî heman kevneşopîyê,* – ew didomîne, – *P'êxember di 77salîya xwe da mirye, wisa, eger mirov ji xwe r'a bike armanc û li ser bingeha pêşbînînîyên nêzîkî heş û sewdayan û kevneşopîyên zerdeştîya hê dereng li danayên dîrokî yên di derbarê Zerdeşt da biger'e, wê demê ew salên 628 – 551ê yên berî s.m. ne..."* (*Ричард Фрай,* Наследие Ирана, Москва, 1972//*R'îçard Fray*, "Mîrasa Îranê", Moskova, 1972, r'û. 52 – 53).

Û *Vîştaspayê* r'astîn jî hema ev bûye, her çiqas hinek ç'avkanî wî wek *"serdarê herêmên bakûrî yên dewleta hexamenîyan"* didin xuyan, lê di r'astîya xwe da ew p'adişahê *Medya kevnar* ê berî yê dawîyê bûye. Di beşên cuda yên *Avêstayê* da *Kavî Vîştaspa* wek p'iştovanê p'adişahî û dostê *Zerdeşt P'êxember* tê bîranîn, ê ku hatye ser r'êya r'astyê û li dû bawerîya yê *R'izgarîdar* çûye.

Di derbarê *Kavî Vîştaspa* da, wek piştovanê *Zerdeşt P'êxember,* di *"Gatan"* da agahî hene. Bala xwe bidinê, k'a li wira çi tê gotin:

*"Divê mirov berê pêşin dostê wisa baş nas bike? – Zerdeşt P'êxember* pirseke hr'êtorîk dide û bi xwe jî bersîva wê dide. – *Helbet, ew piştovanê p'adişahî ye, ew serok (kavî) Vîştaspa ye.*

*Ez bi pesnbêjîyên Ahûra-Mazda û bi R'amana Qenc ji bo wî dibêjim".*

Û – ya dinê jî:

*"Wisa Kavî-Vîştaspa*
*Bi Desthilata vê yekîtîyê gihîşt,*
*Li ser r'êya r'astîya Bîrûbawerîyê*
*Bi Zanînên Qenc derdik'ete pêş:*
*Bila Mazda Ahûrayê pîroz*
*Ya me bi r'ayê xwe bîne sêrî!"*

*Kavî-Vîştaspa* p'adişahê yekem bûye, yê ku li *Zerdeşt P'êxember* xwedî derk'etye û bîrûbawerîya wî di nava gel da belav kirye". *(Гаты Заратуштры.* Перевод с

авестийского, вступительные статьи, комментарии и приложения *И. М. Стеблин-Каменского*, Санкт-Петербург, 2009//Gatên Zardeşt. Wergera ji zimanê avêstî, gotarên pêşekî, şirove û pêvek ên *Î. M. Stêblîn-Kamênskî*, Sankt-Pêtêrbûrg, 2009, r'û. 123 û 153; *Ричард Фрай,* НаследиеИрана, Москва, 1972, стр. 62 – 63//*R'îçard Fray*, Mîrasa Îranê, Moskova, 1972, r'û. 62 – 63; *Ezîz ê Cewo,* Êzdîtî: Divê mirov rastîya wê li ku bigere?, Amed, Weşanên **J&J** – 2017, r'û. 71 – 73).

Bala xwe bidinê, *Zeredeşt P'êxember* Kavî Vîştaspa r'êber nav dike!

Îro êdî t'u şik û guman nemaye, ku Kavî Vîştaspa ne ku t'enê piştovanê *Zerdeşt P'êxember* bûye, lê, her weha, ewî bîrûbawerîya wî jî di nava gel da belav kirye..

**– Spas, naha êdî hat zanîn, k'a bi r'astî piştovanê Zerdeşt P'êxember k'î bûye. Lêbelê, nayê zanîn, k'a çima, di dîroknûsîya (k'ronologîya) kevneşopî da navê Kavî Vîştaspa derbaz nabe. Hûn dikarin, ji xwendevanên me r'a sedemên derk'etina evê t'evlihevîya dîrokî şirove bikin.**

– Hûn dizanin, mirov dikare t'evahîya r'astîya pirsê di wê da bibîne, ku p'adişah *Kavî Vîştaspa* di dema xwe da bûye sembola net'ewa *medî*. Heya berî destpêka sedsala XX danerên (nûser) ermenî, dema di derbarê *medan, Îştûvêgûyê (Astîagês)* p'adişahê wan ê dawîyê û k'urdan da axivîne, ew wek *"ên ji nivşên Vîştaspa"* an jî *"peyhatîyên Vîştaspa"* nav kirine (di vê derbarê da bi hûrbînî di bersîva pirsa We ya duyem da hatye vegotin).

Lewra jî, dema ç'îrokbêj û lêpokar (sextekar) ên dîrokê yên qesrê t'evlîhevîyeke weha pêkanîne, armanca wana her ew bûye, ku r'êbrê net'ewê yê bi nav û deng bidin jibîrkirin, û bi wê yekê r'a, wisa jî, dîroka gelê med û peyhatîyên wî yên r'astedêr – k'urdan, ji cîhanê û ji xwedîyên wê dîrokê bi xwe veşêrin.

Lewra jî, ji bo ku r'stîya dîrokî derê r'onahîyê, k'a em binihêr'in, wan lêpok'arên dîrokê çi ji nivşên dihatûyê veşartine.

Wek ku êdî hate gotin, hinek ç'avkanî Kavî Vîştaspa wek *"serdarê herêmên bakûrî"* bîr tînin, û dibêjin, xwedêgiravî, dema *Zerdeçşt P'êxember* li wan deveran wek mirovekî sergedan, p'enagerekî bê cî û st'ar p'eyda bûye, ew li wî xwedî derk'etye, jêr'a bûye piştovan û, paşê jî, bawerîya wî p'ejirandye. Û ew jî wê demê, dema di beşên cuda yên *Avêstayê* da ew (Vîştaspa) r'êber û piştovanê p'adişahî û dostê *Zerdeşt P'êxember* hatye navkirin, yê ku r'abûye ser r'êya yê Rizgarîdar.

Lê dîsa jî, di ç'avkanîyên cuda û gotarên ênt'sîkopêdî da tê gotin, ku ne ew welat, ê ku *Vîştaspa* rêberî lê kirye, ne jî serdema jîyana wî bi şêwazekî bawerîdar ne dyar in, her çiqas bi giştî di derbarê hebûna wî ya r'eal da li bal hîç kesekî pirs û guman nînin.

Nêr'îneke balk'êş e, ne wisa?!

Ma, gelo ev ne p'aradok's e, ne tiştekî dûrî heş û sewdayê mirov e?

Ma, gelo, dikare wisa bibe, ku mirovek r'êvebirîyê dewleteke gewre bike, xudanê xêran be, piştovanîya p'êxemberekî wek *Zerdeşt* kiribe, lê di derbarê wî da hîç tiştek bi misogerî ne dyar be?

Li vira, helbet, pirs dertê hole, k'a, gelo, cudaxwendineke weha ji k'u tê? Ma ne, agahîyên dîrokî yên bêhtir pêbawer hene, lê zanîyar bi t'u awahî *"nikarin"* şopên *dewletekê*, *padişahê* wê û *pêxemberê* wan, ên ku bi r'êalî hebûne, bibînin. Çawa dibe?

Erê, helbet, hîç tiştek jî dê ne dyar be, eger di dîroka sedê salan da her tişt heya wê astê hatibe lêpovajîkirin, ku agahîyên di derbarê dewleta r'êal a dîrokî, û p'adişayê wê yê ji nivşên tor'inan da, werguhêr'î ç'îr'ok û efsaneyên sedsalên navîn kiribin, ên ku di derbarê r'eşên şevê û qerat'ûyên dinê yên xiyalî da hatibûne gotin!

Û paradok'seke dinê jî ew e, ku *di hinek ç'avkanîyên dîrokî da Vîştaspa wek p'adişahekî nebînayî û bêhemp'a, têk'oşer'ê ji bo bawerîya r'astîn û dadwerîyê didin nasîn, bi t'aybet lehengîya wî ya serbazîyê didin xuyan, lê di hineke dinê da ç'avnebiharîyê*

*û sewdaserîyê bi nave wî va datînin…* (*МирчаЭлиаде*, «История веры и религиозных идей», том I, Москва, 2002//*Mîrça Êlîadê*, “Dîroka olan û hizrên olî”, berg I, Moskova, 2002, r’û. 281; Мифы народов мира (Энциклопедия). Гл. Ред. *Токарев С. А*., 1980, стр. 198 и 282// Mîtên gelên cîhanê (Ênt’sîklopêdî). Êdîtorê sereke *Tokarêv S. A*., 1980, r’û. 198 û 282; *Ezîz ê Cewo*, “Êzdîtî: Divê mirov rastîya wê li ku bigere?”, Amed, Wşanên **J&J** – 2017, r’û. 68 – 70 û **Wik**.)

Divê bê gotin, ku guhar’tina daneyên dîrokî û lêpovajîkirina agahîyên di derbarê bûyerên serdemên bihurî da t’u demê jî r’anewestyane. Ewana k’etine bingeha r’êbaz û mêtoda “zanistî” ya dîroknûsî û siyaseta fermî ya dewletên herêmê yên mêtînger.

Û îro ne ku t’enê cîyê matmayînê ye, ku di cîhanê da êdî gav bi gav fêrî wan “t’êorîyên” *lêp ên dûrî zanistê û zanebûnê* dibin, lê wisa jî cîyê xemgînîyê ye, ku hê jî gelek lêger’înerên welatên cîhana şaristanî bi hêsane ewan agahîyên lêpovajîkirî bi k’ar tînin û p’arç’eyên cuda ji wan ç’îrokên dûrî heş û sewdayê t’endurust di berhemên xwe yên zanistî da wek ç’avkanîyên pêbawer didin xuyan.

Helbet, mirov tê digihîje, ku ewana wê bi k’ar tînin, ya ku li ber destê wana heye, û li ber destê wan jî ji bilî ç’avkanîyên farsan, tiştekî dinê nînin. Lê hinek lêger’îner jî an nikarin mînakên lêpovajîkirinên dîrokê yên konkrêt destnîşan bikin û wan bi zanistî vala derxin, an jî hewl didin, ku ji çarç’oveya *“normên”* pêkanîna erk’a *“zanistî”* derneyên. Di encama nêzîkbûneke weha da îro di dîroka gelên vê herêmê û t’evahîya cîhanê da ewqas r’ûpelên tarî û ne dyar hene.

Û, lewra jî, ji bo ku dîrok werguhêr’î *demnûsîya (k’ronologî) paradoksên sedsalên navîn* nebe, ji bo ku bûyerên dîrokî êdî wek *ç’îrok-efsaneyan* neyên xuyan, ji bo ku xwendevan bikaribe tê bigihîje, k’a bi r’astî di derbarê çi da tê vegotin, divê mirov tayê pêşk’evtina heşmendî ya bûyerên dîrokî bibîne, û dema lêger’înên zanistî xwe li wî tayî bigire û p’arç’e bi p’arç’e dîmenê dîroka wê serdemê yê r’êal û r’astîn vejinîne.

Lê, eger agahî û daneyên dîrokî heya wê astê hatine lêpovajîkirin, ku p’ir’ dijar e, mirov bikaribe wan jinûva vejinîne? Lê, eger di hezarê salan da bi mabest û r’ê û r’êbazên t’aybet, ew agahî û dane wisa lêpovajî kirine, r’astîyên dîrokî gîhandine r’ewşeke wisa, ku neên naskirin, û di rewşwke weha da mirov dijwar bikaribe, hîç nebe, bi şêweyekî nêzîke dîmenê bûyerên dîrokî vesazîne?

Hema bi van mitale û r’amanan jî min lêger’înên xwe yên zanistî domandin, û ez gav bi gav nêzîkî ver’esandina sur’a jîyana *Kavî Vîştaspayê* bêhemp’a û nebînayî, piştovanê *Zerdeşt P’êxember* bûm.

Û wê demê li ber min pirseke dinê jî r’û da: *“Gelo, çima di demnûsîya dîrokî (k’ronologî) da navê Kavî Vîştaspa nayê bîranîn? Ma ne, di Gatên Zerdeşt P’êxember da ji bo wî pesinbêjîyên r’astedêr hene, û di ç’avkanîyên ermenîyan ên kevnar û yên sedsalên navîn da medan, Îştûvêgûyê (Astîyagês) p’adişahê Medyayê yê dawîyê û k’urdan bi xwe bi navê wî didin nasîn û wana wek nivş û peyhatîyên wî nav dikin!?”*

Çima?

Dema êdî li bal min dîmenekî dabeşkirina demajoyan a serdema mijara lêger’înê pêk hat, min êdî karibû lêger’înên xwe bi r’êya analîza agahî û daneyên dîrokî ya hemberhevkirinî bidomînim û dyar bikim, k’a ew aghîyên dîrokî di derbarê k’îjan padişahî da ne.

Me wê demê çi dizanibû?

Ya sereke ew bû, ku:

–*Zerdeşt P’êxember* heya sala 551-ê a b.z. di *Medyayê* da jîyaye û erk’a p’eyamdarîya bawerîya xwe pêk anye;

– anegorî hejmartinên *R’îçard Fr’ay*, *Zerdeşt P’êxember* sala 588-an a b.z. *Kavî Vîştaspa* anye ser bawerîya xwe;

– lê, anegorî demnûsîya dîrokî, di *Medyayê* da *Uvaxšatra* (*Kîaksar*, salên 625–585-

an ên b.z.) p’adişahtî kirye.

Çi dertê hole? – Di sere min da vê pirsê r’û da.

Ma ne, anegorî hejmartinên *R’îçard Fr’ay*, dema *Zerdeşt* Kavî Vîştaspa anye ser bawerîya ola xwe sala 588-an a b.z. bûye! Encamên analîza hemberhevkirinî ya agahîyên dîrokî wê pêşdîtinê misoger dikin, ku *Zerdeşt P’êxember* di *Medyayê* da jîyaye û bi p’eyamdarîya bawerîya ola xwe va mijûl bûye. Wisa jî tê zanîn, ku *Kavî Vîştaspa* li *Zerdeşt P’êxember* xwedî derk’etye û piştovanîya wî kirye. Û *Zerdeşt* bi xwe di *Gatan* da wî *“piştovanê p’adişahî û serok”* nav dike. Lê di destnivîsarên ermenîyan ên kevnar da hem med, hem jî k’urdên peyhatîyên wana wek ên ji nivşên *Vîştaspa*, an jî, yên ji t’ûra *Vîştaspa*, peyhatîyên *Vîştaspa* tên bîranîn. Ango, her tişt di wê derbarê da dibêje, ku piştovanê *Zerdeşt* ê p’adişahî û serokê *Medyayê Kavî Vîştaspa* bûye...

Û, eger ev hemû heşmendî ye, wê demê di derbarê pirsa van du navên cuda da mirov çi dikare bibêje – Vîştaspa û *Uvaxšatra//Kîaksar*?

Belê, li ber ç’avaan e, ku hemû dane li hev digirin, ji bilî navan!

Ev hevnegirtina ji k’u tê, gelo? Ma, xwe nikaribûn du mirovên cuda di heman demê da r’êvebirîya heman welatî bikirana?

Çawa dibe, ev tiştekî dûrî heş û sewdayê mirov e – tiştekî mîstîkî ye!

Û li vira erk’a min dijwartir dibe.

Mirov çawa bikaribe evê t’evlihevîyê ji hev ver’esîne?

Berî vê, li jorê min hinek bersîvên wan pirsan nirxandin, ên ku dikarin r’û bidin. Ji bo wê min agahîyên efsane û ç’îrokên kevnar û yên sedsalên navîn danîn hêlekê, û giranîya xwe da ser wan pêşdîtinên heşmendî, yên ku ji hêla hinek zanîyaran va hatibûn zimên. Piştr’a min ew dîtinên r’awêjî (hîpotêtîk) li ser bingeha daneyên dîrokî pêşxistin û nêr’îna xwe anî zimên. Lê paşê ev nak’okîya hanê (kazûs!) li pêşîya min da der, ya ku li ser r’êya lêger’înên min bû kelem.

Lêbelê, her çi jî hebû, min bi bir’yar lêger’înên xwe domandin...

Min ew jî dizanibû, ku bi hewlên ç’îrokbêj-lêpok’arên (sextekar) farsan ên derdorên qesrê *dane, têrmîn* û *navên* dîrokî wisa hatine lêpovajî û t’ewşkirin, ku mirov dijwar bikaribe serederîyê li wan bike û r’astîya dîrokî bibîne.

Paşê, hê dereng, dema daneyên dîrokî yên nû p’eyda bûn, ji bo min derfet çê bû, ku bi r’êalîstî li bûyerên dîrokî binihêr’im û wana bi zanistî wat’edar bikim.

– Ma ne, ji bilî van hemûyan, wisa jî ç’avkanîyên dîrokî yên dinê hene, û mirov dikare lêger’înên xwe di wan da jî bidomîne? – Min bi xwe ji xwe r’a got û k’arê xwe yê lêger’înî domand.

Ji bilî vê, wisa jî t’erefê pirsgirêkê yê dinê heye: *balk’êş e, gelo, dema pêkanîna k’arên wisa yên giran û ciddî, yên wek kodver’esandina (deşîfrekirin) nivîsarên (têk’st) P’irtûka Pîroz, hemû qanûn û prênsîp hatine şopandin?*

Û ev jî ne pirseke bê bingeh e, ew îro jî benda besîva xwe ye!

Ji bilî vê min r’êzek têrmîn hemberî hev kirin, ew nirxandin û analîza zimanzanî (*linguistic*) ya her yekê ji wan cuda pêk anî. Û, dema dibehîya wê yekê ji hole r’abû, ku di vî k’arî da dikare wisa jî pirsgirêka nehevgirina têrmînologî hebe, li ber min pirsên nû r’û dan, û min agahîyên heyî careke dinê li ber ç’avan r’a derbaz kirin, ji t’erefên cuda va li wan nihêr’î û venihêr’î.

Paşê ez careke dinê bi r’êza wan agahîyan r’a derbaz bûm, yên ku di r’astîya pêşdîtinên min ên hîpotêtîk da ez dabûm bawerkirin, min ew careke dinê bi baldarî hemberî hev kirin, lê ewana û agahîyên demnûsîya (k’ronologî) kevneçopî li hev nedigirtin… Ma ne, ew, ku di ç’avkanîyên *ermenîyan* ên kevnar da *medan, Îştîvêgû (Astîagês)* ê p’adişahê dawîyê yê *Medyayê*, û paşê, hê dereng, wisa jî *k’urdan* wek nivşên *Vîştaspa*, peyhatîyên *Vîştaspa* bîr tînin, ev jî govenîyek e di wê derbarê da, ku *Vîûştaspa* bi

r'astî p'adişahê *Medyayê* yê r'eal bûye. Û di vê da hîç guman nine, lewra ku ermenîyan di derbarê k'urdan da ji dûrva nebihîstibûne, ewana ji demên kevnar va (zêdetirî 2500 salan!) bi cînartîya wan dijîn. Û, ya dinê jî, wek ku êdî li jorê hate gotin, dema desthilatdarîya wî p'adişahê *Medyayê* yê bêhemp'a û nebînayî *ji bo ku penaberên ermenî herêmek hatye veqetandin, ku ew di wir da cî û st'ar bibin*, lê hê dereng, dîsa bi fermana wî, r'êberê ciwan ê p'enaberên ermenîyan ê bi nave Parûyr t'acîdar dikin, û bi wê yekê *bingeha dewleta ermenîyaan tê danîn*. (*Ezîz ê Cewo*: Lê k'a, êdî r'astîya dîrokî li k'u ma?.. – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/lê_k_a_êdî_r_astî_li_k_u_ma ; *Ezîz ê Cwo*: Dîlêma dîrokî, yan îdêya fîk's? – https://amidakurd.net/ku/tekst/dîlêma_dîrokî_an_îdêya_ fîk_s ; *Ezîz ê Ce*wo. Êzdîtî: Divê mirov rastîya wê li ku bigere? – Amed, weşanên **J&J,** 2017.– R'û. 82–85.).

Û lewra jî, agahîyên di vê derbarê da, yên ku di ç'avkanîyên ermenîyan da hene, t'u şik û guman di wan da nîne.

Lêbelê, ji bo azir'ukirina (zelalkirina) pirsa hebûna navên cuda ev agahîyana jî t'êrê nakin.

Ev çi r'ewşeke erê-na ye (dîlêmma), gelo ç'areserîya wê nîne, yan...? – Evê pirsê t'avetî nedida min!

Û min bi bir'yar k'arê xwe yê lêger'înî domand!

Û di pêvajoya lêger'înên zanistî da hinek agahîyan bala min k'işandin, ên ku min berî wê zêde wat'e nadabû wan. Dema min p'irtûka "Dîroka Medyayê" ya Î. M. Dyakonov careke dinê bi baldarî p'er' dikir, gotinên di wê derbarê da bala min kişandin, ku *hê ne dyar e, k'a navên Hexemenîyên yekem ên kesî û yên dema desthilatdarîyê ji hev cuda hebûne, yan na!* (R'û. 49) .. .

– Lê binihêr'e, ha! – Min bi xwe ji xwe r'a got. – Ez ji bo ver'esandina sur'a wan herdu navan li her cîyan li r'êyên çareserîyê diger'yam: *Kavî Vîştaspa* û *Ûvaxşatra/Xvaşatra* (bi yewnanî – *Kîak'sar*), lê bala xwe nedaye ser vê yekê!

Eger mirov ji vê hêlê va li vê pirsê binihêr'e, wê demê her bersîvek heye: ew, ku *p'adişah* û *piştovanê Zerdeşt P'êxember* di *Avêstayê* da wek *Kavî Vîştaspa* tê bîranîn, wisa jî di ç'avkanîyên ermenîyan ên kevnar da hem med, hem jî k'urd wek peyhatîyên (nivşên) *Vîştaspa* tên navkirin (bi hûrbînî li jorê binihêr'e!), ew di wê derbarê da dibêje, ku navê kesî yê vî padişahî, yê ku dê û bavê wî dema bûyînê lê kirine, *Vîştaspa* bûye. Lê ew, ku navê wî di demnûsîya (k'ronologî) kevneşopî da wek Ûvaxşatra/Xvaşatra (bi yewnanî – Kîak'sar) tê zanîn, ev ji bo wê serdemê pêkhatineke xwezayî bûye: wê demê ji bilî navên ferdî, yên ku ew di jîyana kesî da pê dihatin nasîn, wisa jî navên wan ên p'adişahtîyê hebûne, yên ku dema t'acîdarkirinê li wan kirine û piştî wê ew di t'evahîya cîhanê da, wek p'adişah, bi wî navî hatibûne zanîn.

Eger mirov van hemûyan t'omar bike, dikare bi misogerî bibêje, ku *(Kavî) Vîştaspa* navê kesî yê *padişahê Medyayê* bûye, û bi wî navî ew di jîyana kesî da hatye zanîn, lê .yê duyem – Ûvaxşatra/Xvaşatra (bi yewnanî – Kîak'sar) – navê wî yê dema p'adişahtîyê bûye.

Û dîsa hinek têbînî di derbarê wê dîroka t'evlihevî da:

– ew, ku navê *p'adişahê Medyayê, piştovanê Zerdeşt P'êxember*, hem di *Avêstayê* da, hem jî di *nivîsarên (têkst) pehlewîyan* da wek *Kavî Vîştaspa* tê zanîn, lê di farsîya nû da wek *Goştasp/Gûştasp* tê bîranîn, ew bingehê dide, ku mirov wê wek encama *hewlên ç'îrokbêj*-lêpek'arên *dîrokê yên fars ên derdorên qesrê* bibîne;

– di nava k'urdan da *Vîştaspa* wisa jî wek Key Aksar tê zanîn (*Kîaksar* – di yewnanî da), û ev yek bi wê tê şirovekirin, ku ew ji binemala *Keyanîyan* bûye. (*Ekrem Cemîl Paşa.* Dîroka Kurdistan bi kurtebirî, Bruksel, 1995, rû. 231–234);

– peyva *Ûvaxşatra/Xvaşatra* jî, ya ku di dîrokê da wek navê *Vîştaspa* tê bîranîn, wek ku tê xuyan, p'eyveke *medî* ye, û tê wat'eya p'adişah. Ew wisa jî bi êtîmologî nêzîkî p'eyva farsîya kevnar a *Xšayāršа / Xşayarşa* ye – navê p'adişahê hexamenîyan ê pêncem, ê

ku di dîrokê da wek *Xşayarşayê I (yewnanî – Ksêrksê I)* tê zanîn.

– ew wisa jî bi êtîmologî nêzîkî p'eyva farsîya kevnar a *xšāyaθiya / xşayatîya ye*, ya ku tê wat'eya p'adişah, û p'eyva hindî ya *kšatra / kşatra* ye – k'arîzma desthilatdarîyê...

Mirov li vira çi dikaribû bigota?

Gelo ji min r'a li hev hat, ku bersîva hemû pirsan bidim, ên ku bi demê r'a k'etibûne ser hev û bê bersêv mabûn?

Mirov dikare bersîva vê pirsê bi pirs bide: «Ma, gelo, tiştekî wisa pêkan e?»

Lêbelê, li vira, li ser r'êya r'onîkirina sur'a r'ûpelên *«windabûyî»* yên dîroka jîyana *Zerdeçt P'êxember* û Kavî Vîştaspayê piştovanê wî yê nebînayî û bêhemp'a – serekfermandarê leheng û t'orinzade, p'adişahê Medîyayê, min karibû bersîva yek ji pirsên sereke û here girîng bibînim.

Belê, ç'îr'okbêj-lêpok'arên dîrokê yên sedsalên navîn ên derdorên qesrê li dora navên *Zerdeşt P'êxember* û piştovanê wî, p'adişahê nebînayî yê *Medyayê – Kavî Vîştaspa* (heman Kîaksar/Ûvaxşatra/Xvaştra) t'oreke agahîyên lêpovajîkirî û çewt hûnandibûn, û ew bibû sur'eke nebînayî ya sedê salan. Û ev sur'a jî, li ser r'êya r'onîkirinaa dîroka r'astîn a Medyayê, a pêxemberê wê yê Gewre – Zerdetê pîroz û p'adişahê wê yê nebînayî û bêhemp'a – Vîştaspa, wek girêhişkekê, bibû asteng. Lê, bi r'onîkirina wê sur'ê derfet çê bû, ku p'arç'eyekî p'ir' girîng ê dîroka *Medya* kevnar bê vesazandin û veger'e ser r'astya xwe.

**– Baş e, spas! Naha, k'a, em pirseke dinê jî binirxînin. Bi dîtina We, di navbera mîtraîtîyê (mîtraîzmê) û zerdeştîyê da çi p'êwendî hene? Ji wan herdu olan k'îjan ji bo k'urdan ya here kevnar e?**

– Di derbarê vê mijarê da zanîyarên cuda lêger'înên zanistî pêk anîne, û berhemên wan jî hatine weşandin. Û di encamê da, di cîhana zanistê da nêrî'nek derk'etye holê, ya ku, eger mirov bi şêweyekî nerm jî bibêje, dibe sedema gelek pirsan.

Û lewra jî, ji bo ku bikaaribin bersîva vê pirsê bidin, k'a, em r'êger'eke wat'eyî (êk'skûrs //excursion) di paşer'oja dîrokî da pêk bînin …

Weha, em binihêr'in, k'a di vê derbarê da îro çi li ber derstê me heye!?

Di destpêkê da divê bê zanîn, ku ne ku t'enê r'amana (îdêa) mîtraîzmê bi xwe li ser bingeha efsaneyan (lêgêndan) hatye avakirin, lê, her weha, vegotina di derbarê wê da û danasînên wê bi xwe jî bêhtir mînanî *efsaneyan* e, ne ku nirxandina zanistî.

Bi xwe lê binihêr'in, li ser bingeha lêger'înên dîrokî yên kevneşopî di wê derbarê da îro nêr'înek derketye holê, ku "mîtraîzm oleke vêdî ya yekxwedayî (monotêîstî) ye, ya ku demekê bi sedsalan hatibûye jibîrkirin, di Împêratorîya R'omayê û Ermenîstanê da nîveka duyem a hezarsala yekem a b.z. di bin bandora civaka mogan (r'ahîban) da pêk hatye, yên ku ji Farsistanê derbazî cîhana hêllênîstî bibûne..."

Ne ferz e, ku mirov olzan be, ji bo bikaribe t'evahîya dijhevîtî û nakokîya van gotinan ji hev cuda bike… Lê di vê dîrokê da nak'okîya sereke ya heşmendî ew e, ku *Farsistan (P'ers)*, di wê serdema dîrokê da bi wî şêwazî nînbûye. Heya sala 550-î ya b.z. *Împêratorîya Medyayê* hebûye, û herêma farsan jî yek ji satrapîyên (wilayetên) wê bûye.

Lê pey derbeya qesrî ya sala 550-î ya b.z. heya êrîşa *Alêk'sandrê Makêdonî (Îskender)* a salên 331 – 330-î ew xahermendî ne ku ya hexemenîyan, lê *Împêratorîya Med û Farsan* bûye. Wisa ku, wê demê r'ahîbên zerdeştîyê (mog) t'enê dikaribûn ji *Medyayê* her'in cîhana hêllênîstî, lewra ku zerdeştî di *Medyayê* da pêk hatye û ji wira jî li herêmên cîhanê yên dinê belav bûye!

Û ya dinê jî, pirs dertê hêlê, eger mîtraîzm nîveka duyem a hezarsala yekem a b.z. di bin bandora civaka mogan da pêk hatye, yên ku cîguhêzî cîhana hêllênîstî bûne, li vira çi pêwendîya Ermenîstanê bi vê pirsê r'a heye? Ma, Ermenîstan jî wê demê di nava cîhana

hêllênîstî da bûye?

Erê, heya sedsala VI a b.z. ermenî li Fr'îgîayê bûne, lêbelê, tê zanîn, ku di heman sedsalê da ewana bi sedemên cuda neç'ar bûne, cî û miskenê xwe bihêlin. Paşê, li ser r'êya p'eydakirina cî û warkî nû gihîştine ber sînorên Împêratorîya Medyayê, û padişahê medan – Ûvaxişatra / Kîak'sar / Vîştaspa beşê xaka Ûrartûyê yê kafkasî, ya ku ewî bi xwe berî demekê hildabûye û kiribûye nava sînorên împêratorîya xwe, dide wana, ku ew têda bihwirin. Hê dereng r'êvebirîya Medyayê bir'yar dike, r'êberê p'enaberên ermenîyan ê bi navê Parûyr t'acîdar bike, û bi wê yekê ji bo wana dewletê dadimezirîne (di vê derbarê da bi hûrbînî li jorê hat gotin).

Û tiştekî balk'êş jî: ew, ku di mîtologîya ermenîyan da tê gotin, ku li serê Mîhr (Mîtra) k'umê ermenî-fr'îgî hebûye, wek ku tê xuyan, ew dengveger'a ji mak-welatê wan a ji Fr'îgîyayê ye, û hema ji wira jî di dema xwe da ewana derbazî Asîya Biç'ûk bûne.

Tê zanîn, ku hîç net'ewek, hîç ol û bawerîyek di cîyekî ji derdorên xwe r'a girtî da pêk nehatye. Di cîhanê da her tişt di nava hev da, bi şêweyekî di nava p'êwendîyan da ye. Eger mirov bi k'urahî lê binihêr'e, heya di nava bîrdozîyan, an bîrûbawerîyan da jî dê kêm-zêde t'erefên hevbeş bibîne. Lê ew dê nikaribe wek govenîya hemanîbûna wana bê dîtin.

Lêbelê, wek ku tê xuyan, ji bo ku tiştekî weha pêk bînin, zanîyaran ji t'êra xwe zêdetir hewl dane, û «peytandine», ku di Asîa Biç'ûk a hêllênîstî da xwedavendê avêstî (zerdeştî) bi xwedayên cuda yên deverî û yewnanî r'a gihîştine hev û bûne yek, û evê jî çend bingehên xwezaya destpêkî (îpostasî) yên Apollon-Hêlîos-Mîtra-Hêrmês gîhandine.

Ku bi navbeynk'arîya yewnanî û anatolîyî, navê pîroz (*theonym*) ê avêstayî r'ê li ber pêkhatina navê xwedavendê r'omî yê bi navê *Mîtra (Mithras)* vekirye, yê ku pîrozîya sereke ya mîstêrîyên r'omî yên sedsala yekem e, û hema tomerîya wan jî wek *mîtraîzm* hatye zanîn.

Ango, ji vê dîtina mîtologî (efsaneyî) dertê holê, ku *mîtraîzm*, wek şaxekî olî ne yekawa ye. Ku di sedsala yekem da ew wek şaxekî olî-mîtologî pêk hatye, yê ku t'omerîya mîstêrîyên (nihanên) r'omî bûye. Û hema ev jî paşê, hê dereng, wek *mîtraîzm* hatye zanîn (?! – E. C.).

Lêbelê, di cîhana zanistê da hatye p'ejirandin, ku agahîyên here kevnar û bêhtir pêbawer di derbarê Mîtra da di Avêstayê da hene, berî hemûyan jî, di beşê wê yê "Yaşta" X da. Û, ya balk'êş ew e, ku li bal lêger'îneran hîç şik û gumanek nîne, ku erka Mîtra ya hevhatinî ji bo kevneşopîyên *Avêstayê* di r'êza yekê da ye. (https://gufo.me/dict/mythology_encyclopedia/%D0%9C%D0%98%D0%A2%D0%A0 %D0%90)

Hema wisa!

Ango, çi dertê hole – lêger'îneran li ser bingeha mînahevbûna şêwazî (formal) ya hinek dîyardeyan û navên pîrozîyan (têonîm) ew gîhandine hev û kirine yek, ên ku hîç bi t'u awayekî jî nikarin yek bin!? … Û piştî van hemûyan, dibe ku, divê mirov ne ku di derbarê wê da bibêje, k'a têk'ilî di navbera *mîtraîzmê* û *zerdeştîyê* da hene, an na, an jî k'îjan ji wana ji bo k'urdan ola here kevnar e, lê hewl bide, zelal bike, k'a *mîtraîzm* bi giştî çi ye: ew mîtolojî ye, bawerî ye, ol e, yan berhema hewlên lêger'îneran e, ji bo ku mîtolojîyên gelên cuda, yên ku bi bingeha xwe va ji hev cuda ne, bigihînin hev û bikin yek?

Û, ji bilî vê, eger hatye p'ejirandin, ku bawerîya *Mîtra* derdorê sedsala IV a b.z. pêk hatye, lê p'erestina wî, bi nêzîke, derdorê sedsala yekem derk'etye ser pilana pêşin û ola mîtrayîyê (mîtraîzmê) dest pê dike, berbi r'ojava va belav bibe, heya her'e–derê Bakûrê Îtalîyayê, lê pirsa *zerdeştîyê* bi binî va cuda ye. *Zerdeşt P'êxember* kesayetîyeke dîrokî ye, ew med bûye. Nîveka yekem a sedsala VI a b.z. ew di Împêratorîya Medyayê da bi k'arê şirove û p'eyamdarîya bîrûbawerîya xwe r'abûye û di encamê da bûye P'êxemberê Gewrw yê hemû dewr û zemanan…

**– Di p’irtûka We ya navborî da wisa jî di wê derbarê da tê gotin, ku zerdeştîyê bandora xwe li ser îslamê jî hişte. We dikaribû, evê mijarê bi awayekî konkrêt r’avebikira?**

–Hûn dizanin, ez ne pisporê ola îslamê me, û bi giştî ne olzan im jî, lê ez dikarim t’enê wan nêr’înên pisporan bînim, ên ku îro li hole ne û li ser bingeha analîza zanistî-r’exneyî di derbarê wê mijarê da dîtina xwe ava bikim…

Em ji serer’astkirineke biç’ûk destpê bikin. Di p’irtûka min a navborî da t’enê di derbarê bandora zerdeştîyê ya li ser îslamê da nîne. Ew bandor berfirehtir e. Weha, li wir çi tê gotin: *“Bîrûbawerîya Zerdeşt P’êxember bandoreke mezin li ser xaçp’arêzîyê, îslamê, û bûdîzmê, li ser gnostît’sîzmê û daosîzma çînî hiştye. Ewê bandoreke mezin li ser r’amana felsefî ya R’ojhilatê û R’ojavayê hiştye…”* – Û evan gotinana cara yekem ji hêla min va nehatine gotin. Eva nêr’îna di cîhana zanistê da ji mêjva dyar e. Her warekî bandora zerdeştîyê bi serê xwe babeteke lêger’înên cuda ye. Lê çi ku di derbarê bandora wê ya li ser îslamê da dimîne, divê mirov wê di nava goveka olên îbrahîmî da binirxîne.

Wek ku tê zanîn, dema mirov di derbarê olên îbrahîmî da diaxive, bi bingehîn mabest ev sê bîrûbawerî ne: *yehûdîtî, xrîstîanî (xaçp’arêzî)* û *îslam*. Û hersê ol jî, anegorî kevneşopî û nivîsarên pîroz, şaxên heman bawerîya yekxwedayîyê ne (monot’êîzm), ya ku Îbrahîm jê bawer kirye. Di vê da faktora navendî bawerîya yek Xwedaî ye, yê ku di cîhana me ya sêpîvan da nikare bê dîtin û hîskirin, ew Xweda sazûmandar, ê ku her tiştî dibîne, ew yê herî hêztirîn e, û li derî Gerdûna me ye, lê heman demê ew ji tamara xewê (şahtamar) jî bêhtir nêzîkî me ye (Quran, 50:16). Ew, ku di van olan da tê gotin, ku Îbrahîm destnîşan nekirye, k’a divê mirov çawa û bi çi şêweyî p’erestina xwe li hember Sazûmandar (Xwedê) pêk bîne, di wê derbarê da dibêje, ku ên di bingeha kont’sêpta bîrûbawerîya îbrahîmî ya yekgirtî danîne, ewana bi xwe ev îdêya ji nûva dernexistine, ew êdî berî wan amade bûye, û wana her ew p’ejirandine. Û pêkanîna wê t’enê anegorî normên sotsîalî yên wê demêç hatibûye dyarkirin: ew hatye p’ejirandin, ên ku anegorî wan pîvanan bûne, lê ya ku ne anegri prêsîpên bawerîya wan bûye, hatye r’edkirin.

Bi kevneşopî hatye p’ejirandin, ku anegorî prêтnsîpên yekxwedêtîya îbrahîmî (monot’êîzm), her olek, a ku bawerîya wê bi yek Xwedayî heye – Xwedayê ku nayê dîtin û hîskirin, bi r’ewan û bawerî mafê wê heye, îbrahîmî bê navkirin. Û hîç kesek napirse, k’a monot’êîzm ji k’u derk’etye, an jî berî p’eydabûna van olan ên dinê yên yekxwedayî hebûne, gelo, an – na?

Dema di derbarê yekxwedêtîya olên îbrahîmî da diaxivin, di derbarê zerdeştîyê da *“ji bîr dikin”*. Lê, di heman demê da, zerdeştî bi îdêolojî ola kevnartirîn a yekxwedayî ye. Û di encamê da, p’ir’anîya olan, bi awayekî di bin bandora wê bîrûbawerîyê da pêşketine, a ku ji hêla Zerdeşt Pêxember va hatye sazûmandin.

Û, ya dinê, ji bo zerdeştîyan drozgeya ku r’ojê pênc caran tê pêkanîn (a berbangê – ya berî hilatina *R’ojê*, ya nîvro, ya berî êvarê – berî ku *R’oj* her’e ava, ya dema *R’oj* diçe ava û ya şevê) divyatîya ferzî ye. Ya ku balk’êş e jî, ew e, ku di îslamê da jî demên pêkanîna drozgeyê mînanî yên zerdeştîyê ne. Û ev jî hemû nine! Li bal zerdeştîyan jî berî dirozgeyê xweşûştinê pêk tînin (destnimêj). Û divê bê zanîn, zerdeştî jî zêdetirî hezarsalekê berî p’eydabûna îslamê hebûye!

Û ji vê jî zêdetir! Zerdeştî bawer dikin, ku hemû mirov piştî ku r’êya xwe ya vê cîhanê bi dawî dikin, diçin li ber dada t’ewre bilind û ya here r’ast û dadwer a *Ahûra Mazda* disekinin. Li ser gelîyê Dojehê r’a dê p’irek berbi wî berê dinê va bê avîtin, li k’u baxçeyên Bihuştê ne. Ev p’ira dê ji bo mirovên r’ast, dilovan û dadwer fireh be, lê ji bo r’uh û r’ewaanên xwedî sûc dê wek devê k’êreke tûj zirav û tenik be. Yên suck’ar dê nikaribin xwe li ser wê r’agirin û dê bik’evin hemêza agirê Dojehê, û ewê heta hetayê di wir da bimînin. Dîtina zerdeştîyan di derbarê *R’oja Dawîyê* da weha ye. Û, her çiqas,

tiştekî wisa di *Qurana pîroz* da nine jî, dîsa, anegorî kevneşopîyên îslamê, *"r'êya r'ast"* (*csiraata el musteqîn*) di şiroveyan da hema bi şêwazê p'ireke weha tê vegotin, ya ku ji bo mirovên *r'ast, dilovan û dadwer* dê fireh be, lê ji bo yên sûckar dê tenik û zirzv be.

Zerdeştî bi bawer in, wek ku destpêka neqenc a dervayî mirov heye, wisa jî – ya hindur'în, a ku mirov berbi gotin û k'arên ne p'ak va didefîne. Bi nêzîke dîtineke weha di îslamê da jî hey…

Wek ku di zerdeştîyê da, wisa jî di olên îbrahîmî da hebûna Bihuştê û Dojehê tê p'ejirandin, wisa jî, hem di zerdeştîyê da, hem jî di olên îbrahîmî da bi *R'oja D'awîyê* bawer dikin. Di bîrûbawerîya *Zerdeşt P'êxember* da hem ji bo mrov, hem jî ji bo xwezaya hawîrdorê cîyekî t'aybet ji bo hîgîênaya (paqijî) ferdî û pêkanîna dirozgeyan hatye veqetandin.

Dema şev û r'oj weke hev dibin, cejna baharê – Newroz tê pîrozkirin. Ew ji bo zerdeştîyên kevnar yek ji cejnên sereke bûye. Wê r'ojê t'erefdarên *Zerdeşt P'êxember* şad bûne û kuç'ik (agir) dadane, bi wê yekê dirozgeya p'erestinê pêk anîne. Newroz ji erd û aqarên Îrana Mezin derbazî nava gelên cînar ên Asîa Navîn jî bûye.

Yek ji êlêmêntên bandora zerdeştîyê li ser çanda gelên misulman wisa jî r'eng û r'ûç'ikê wan ê şêwazî ye. Gotina min di derbarê smêlberdanê û r'ûkur'kirinê da ye. Bi bingehîn ew di nava niştecîyên K'urdistanê da pêk hatye, wisa jî hinek gelên dinê ev yek ji k'urdan hildane. Simêl li bal k'urdan (bi t'aybet jî li bal k'urdên êzdî) wek sembola r'ûmeta mêran tê dîtin. Mêrên k'urd gelek caran bi simêla xwe sond xwarine. Ewana dest danîne ser simêla xwe û gotine: "Ez bi vê simêla xwe sond dixwim!" an jî, "Eger li ser soza xwe nemînim (an soza dayî pêk neynim), ezê vê simêla xwe kur' bikim!"

Û, her çiqas îslam, berovajî vê, bang dike, ku simêlan kur' bikin û r'ûyê xwe berdin, dîsa jî di nava misulmanan da gelek kes simêlan berdidin.

Û piştî belavbûna îslamê jî k'urdan ne ku t'enê dest ji simêlan bernedane, lê, her weha, ew kevneşopî bi r'êya wana di nava gelên misulman ên dinê da jî belav bûye, bi t'aybet jî di nava gelên t'ûrkî (t'ûrkîaxêv) da, yên ku pêwendîyên wan bi k'urdan r'a hebûne....

Dibe ku, li vira pirseke mafdar derê holê, k'a, gelo, *di nava îslamê da ewqas kevneşopîyên zerdeştîyê ji k'u peyda bûne?* – Helbet. Hinekê bibêjin, ew ji ber wê ye, ku di dema xwe da zerdeştîyan jî îslam p'ejirandine. Lê ev her t'enê beşekî r'astîyê ye. Ç'avkanîya here sereke mogên zerdeştîyê (r'ahîb) bûne, yên ku bi destê zorê kirine xizmeta ola îslamê. Û, eger mirov wê r'astîyê li ber ç'av bigire, ku îslama destpêkê, ya ku nû destpêkiribûye belav bibe, oldar û şirovegerên wê yên xwendî nîbûne, lê zerdeştî, êdî hezar salî zêdetir bûye, ku hebûye, xwedî sazîya xwe ya r'êk û pêk bûye, û êdî oldar (mog) û şirovegerên wê yên xwendî hebûne.

**– Wek ku tê zanîn, Hûn di Ermenîstanê da ji dêya xwe bûne, p'erwerdeya We bi zimanê ermenî bûye, We ç'avkanîyên ermenîyan xwendine û di warê wan da lêger'în pêk anîne. Ji k'erema xwe r'a bibêjin, agahîyên ç'avkanîyên ermenîya yên di derbarê zerdeştîyê da ji yên dinê bi çi cuda dibin?**

– Hûn dizani, mirov di vê derbarê da çi dikare bibêje?

Tê zanîn, piştî ku sala 301-ê di Ermenîstanê da xaçp'arêzî wek ola dewletê hatye p'ejirandin, hemû p'erestgehên berî xrîstîanîyê hatine r'ûxandin. Û piştî vê yekê di Ermenîstana xaçp'arêz da li ser vê mijarê tabûyeke nenivîsî hebûye. Û ev xwezyî ye, lewra ku k'arên r'amyarî di Ermenîstanê da û derî wê di nava dîwarên dêra ermenîyan da pêk hatine. Û heya serdema Sovêtê bi bingehî navendên r'onahîdarîyê dêr bûne. Û di wan da jî p'ir' bi k'umr'eşî (hevsûdî) li dîroka berî xrîstîanîyê nihêr'îne…

Û îro di nava ermenîyan da ew nêr'în serdest e, ku ew ermenî, yên ku ne xaçp'arêz

in, ne ermenî ne. Heya têgeha net'ewol (ցեղավորոն) derk'etye hole. Lêbelê, divê bê zanîn, dibe ku di arşîvên Matênadarana Ermenîstanê (Înstîtûta destnivîsarên kevnar) da destnivîsarên di derbarê wê mijarê da hatibin p'arastin, û, dibe ku, demê bê, û ew dê bên leger'andin û weşandin.

Lê, ewa ku heya îro di Ermenîstanê da di derbarê Zerdeşt P'êxember û zerdeştîyê da hatye weşandin, zêde ji yên welatên cîhanê yên dinê cuda nabe, her çiqas, wek ku li jorê hate gotin, ermenî, wek gel, di nava goveka bandora çandî ya Medyayê da pêk hatine û ji medan jî zerdeştî p'ejirandine.

Lêbelê, her çi jî hebe, di Ermenîstanê da klafeyên p'eresstgeheke agirp'erestîyê ya Gar'nîyê hatine p'arastin, ya ku di serdema Sovêtê da hatye vesazandin. Û îro ew yek ji wan peykerên dîrokî yên Ermenîstanê ye, yên mirov bêhtir diçin dîtina wan. Ew bi serê xwe p'eresgehek a agirp'erstîyê ya t'enê bûye, ya ku di Yekîtîya Sovêtê da hatye vesazandin…

Û ya balk'êş ew e, ku îro di nava ermenîyan da hinek mirov hene, yên ku dixwazin veger'in ser ola pêşîyên xwe ya kevnar a agirp'erestîyê. Ewana bi r'êya lêger'înên zanistî gelek drozge û kevneşopîyên wê olê vejinandine, diçin ber p'erestgeha Gar'nîyê, êgir dadidin, merasimên xwe yên olî pêk tînin. Û heya di nava wan da nêr'înek jî pêk hatye, û anegorî wê nêrînê, t'evkujîya ermenîyan a yekem ne ku sala 1915-an pêk hatye, lê sala 301-ê, dema ermenîyan xrîstîanî p'ejirandine. (http://www.hayary.org/wph/?p =1393 ; http://www.aravot.am/2015/02/ 02/537893/ )

Û gotinên Raffî, nivîskarê navdar ê eremenî yê sedsala XIX, govenîyeke balk'êş in di derbarê helwestên vî r'engî ne – di nava civaka ermenîyan da. Ewî nivîsye: *"Ey kal û bavno, ez vê k'asê bilind dikim, lê wê dîyarî bîranîna we nakim. Eger we li şûna van dêran, yên ku di welatê me da p'ir' hene, we kela ava bikirana, eger we li şûna xaçê pîroz û derdanan, yên ku dewlemendîya me hejar kirine, ç'ek bik'ir'yana, eger we li şûna wan bînxweşîyan, ên ku bîna p'erestgehên me xweş dikin, barûd bik'iryana, îro welatê me dê bextewar bûya. Dê welatê me wêran nekirana, dê lawên me nekuştana û jinên me ner'evanadana... Mirina welatê me bi dêran destpê bû, ewana dilên me û lehengîya me ji me standin, ewana em kaşî nava koletîyê kirin, dema ku Tirdat şûr û t'acê xwe danîn, xaç hilda destê xwe û çû şkefta Manîayê û bû münzevi* (bi k'urdî – *silak* an *slûk*. – wergêr) ...

*Ey xwedayên kevnar, ey Anahîta, ey Vahagn, ey Hayk, ez vê k'asê dîyarî bîranîna we ya pîroz dikim, hûn me r'izgar bikin!..."* ( https://ok.ru/group/52519042220197/topic/64623290728613 )

**– Bi dîtina We, di derbarê berovajîkirina nivîsarên Avêstayê an Gatên Zerdeşt da mirov dikare îro çi bibîje?**

– Li jorê em bi hev r'a di derbarê berovajîkirin, pevguhar'tin û lêpkirinên dane û agahîyên dîroka gelê k'urd a demên kevnar û sedsaalên navîn da axivîn. Û, ya balk'êş jî ew e, ku ji bilî lêpovajîkirina dîroka me wisa jî wê yekê r'ola xwe ya berbiç'av lîstye, ku nivîsarên (têk'st) *Avêstayê* ne hert'im r'ast hatine kodnivîsandin û kodver'esandin (deşîfrekirin).

Tê zanîn, ku dema êrîşa wêrank'ar ên *Alêk'sandirê Makêdonî/Îskender (*salên 331/ 330 ên b.z.) ên ser *Împêratorîya Med û Farsan*, a ku di dîroknûsîya kevneşopî da wek *"dewleta hexemanîyan"* tê bîranîn, *Avêsta* bi t'evahîya xwe va hatye t'unekirin. *Hemû p'irtûk avîtine avên deryayê an dane devê êgir, û, heya, eger hiek nivîsarên vê P'irtûka pîroz hatine p'arastin jî, yek e, ji wir û pêva ew bi bingehîn bi zarkî hatye p'arastin û belavkirin.* Ango, ji lêger'îneran hîç kesekî binenimûneya (orîjînal) , *Avêstayê* li ber ç'avê xwe nedîtye, û her paşê, li ser bingeha kevneşopîya zarkî ya sedsalan nivîsandina nû

(kodnivîsandin) ya têk'stên *Avêstayê* hatye pêkanîn. Eger mirov vê yekê li ber ç'av bigire, dê bê têgihîştin, k'a di nivîsarên wê da çi guhar'tin pêk hatine.

Wek ku îranîzanê sovêtî *Î. M. Dyakonov* dinivîse, pirsa dema pêkhatina beşên kevnar ên *"Avêstayê"* heya naha nahatye zelalkirin. Bi dîtina wî, demekê *Gatên Zerdeşt* ji hêla oldaran (mog/r'ahîb) û t'erefdaarên wê bîrûbawerîyê va bi zarkî hatine belavkirin, lê nivîsandina wana û beşên kevnar ên "Avêsta" biç'k her piştî Darîûsê I pêk hatye, dema nivîsa îranî ya li ser bingeha alfabêya aramî hatye bik'aranîn. (*Дьяконов И. М.* История Мидии. – М. – Л., 1956. – С. 45–46//*Dyakonov Î. M.*, Dîroka Medyayê. – M. – L, s. 1956. – R'û. 45 – 46).

**XXXXX**

Piştî wê, dema bi sedemên cuda ewqas nêr'înên bi nak'ok û dijberî hev di derbarê dem û cîyê nivîsîn û belaavkirina *Avêstayê* da ji bo nivşên dihatûyê wek *"mîras"* hatine hiştin, dê p'ir' dijwar be, ku mirov bikaribe r'astîya dîrokî bibîne. Pirs hem jî bi wê dijwar dibe, ku hem jî nêr'înên dijber ên bi sunî hinartî li holê hene.

Bi dîtina akadêmîk *Î. M. Stêblîn-Kamênskî*, *Avêsta* jî, mînanî *Êncîlê* ji nivîsarên demên cuda hatye berevkirin, yên ku carna bi zimanên mirî hatine nivîsîn, û di wan da şaşîyên r'êzimanî û şiroveyên p'ir' dereng hene. (*Гаты Заратуштры /* пер. с авестийского, вступ. ст., ком. и прил. И. М. Стеблин-Каменского. – Санкт-Петербург, 2009. – С. 27–30 // Gatên Zardeşt. Wergera ji zimanê avêstî, gotarên pêşekî, şirove û pêvek ên *Î. M. Stêblîn-Kamênskî*, Sankt-Pêtêrbûrg, 2009. – R'û. 27–30).

Dema ewqas nedîyarî li hole ne, mirov dijwar bikaribe bibêje, ku di *Avêstayê* da (wek ku di hemû p'irtûkên dinê yên pîroz da!) hemû şêwazên zimanî û agahîyên destpêkî dikaribûn bihatana p'arastin. Êdî mirov di derbarê kodveresandina nivîsarên *Avêstayê* da çi dikare bibêje?

Eger di derbarê nivîsarên *Avêstayê* da bê axavtin, divê ew yek li ber ç'avan bê girtin, ku beşên wê yên cuda piştî cerd û wêrank'arîyên leşkerên *Alêksandrê Makêdonî* bi awayekî ji t'unebûnê hatibûn r'izgarkirin û bi saya hewlên t'erefdarên bîrûbawerîya Zerdeşt Pêxember gihîştibin nivşên dihatûyê, lê paşê li ber destê bernûserên pehlewî û "wergêrên" sasanî r'a derbaz bûne, di wana da gelek guhar'tin û lêpovajîkirin pêk hatine, lewra jî bi şêwazê binenimûneyî (orîgînal) negihîştine ber destê me... (*Гаты Заратуштры:* пер. с авестийского, вступ. ст., ком. и прил. *И. М. Стеблин-Каменского*. – Санкт-Петербург, 2009. – С. 27–30 // GatênZardeşt. Wergera jizimanê avêstî, gotarên pêşekî, şirove û pêvek ên *Î. M. Stêblîn-Kamênskî*, Sankt-Pêtêrbûrg, 2009. – R'û. 27–30)

Di *Avêstayê* da (lo, hema, di zerdeştîê bi giştî da jî!) gelek şêwazên binenimûneyî (orîgînal) hatine windakirin (heman ç'arenûs p'ara *p'irtûkên pîroz* ên olên dinê jî derk'etye. Wek ku tê xuyan, r'astîya cîhana me ya dîrokî weha ye!), û lewra jî ew bi şêwazê xwe yê binenimûneya destêkî va negihîştye me.

Helbet, ev nayê wê wat'eyê, ku her tişt bê veg'er winda bûye. Helbet, na!

Îro zanist heya berhemên cuda yên şaristanîyên kevnar, ên ku negihîştine me, vedisazîne.

Lê di pirsa zerdeştîyê da derfet bêhtir hene. Îro lêger'êner dikarin şopên bingehên zerdeştîyê di nava wê civakê da biger'in, ya ku berî hemûyan ew p'ejirandye, bi t'aybet jî di nava wana da, ên ku bawerîyên wana ji bo pêkhatina bîrûbawerîya zerdeştîyê bûne bingeh. Ango, divê bingehên wê bîrûbawerîyê di nava gelê k'urd da biger'in, bi t'aybet jî di nava *k'urdên êzdî* da (ne di nava *êzîdîyan* da, yên ku t'u têkilîya xwe bi zerdeştîyê r'a nînin, lewra ku bawerîya wana *sofîtrîya îslamê* ye, ne ku *êzdîtî*!)…

Her t'enê pirs di wê da ye, ku ji bo wê pêwîstî bi kadroyên net'ewî yên xwendî, bi pisporên çê heye, yên ku bikaribûna r'astîya dîrokî derxistana r'onahîyê.

Li ser vê r'êyê girîng e, ne ku t'enê pirsa kodver'esandina (deşîfrekirina) nivîsarên *Avêstayê* jinûva li ber ç'avan r'a bên derbazzkirin û nirxandin, lê her weha divê ew nivîsar, ên ku li ser ber û zinaran (ên wek *Bîsêt'ûnê*!), yên ku di serdema *Împêratorîya Med û Farsan* hatine k'olnivîsîn, dema zimanê fermi yê dewletê *medî* (k'urdîya kevnar) bûye, ji hêla zimên û naver'oka wan va jinûva bên lêger'andin û nirxandin. Û, eger encamên kodver'esandinan hemberî nimûneyên zaravên zimanê k'urdî yên cuda bên kirin, wê demê wê derê hole, ku nabe, mirov di derbarê *"zimanê Avêstayê"* an ê *"farsîya kevar"* da biaxive, lewra ku herdû "ziman" jî di xwezayê da nîninbûne, ew navana bi sunî hatine hinartin, û hem *Avêsta* bi xwe, hem jî nivîsarên ser ber û zinaran bi zimanê *medî* (*k'urdîya kevnar*) hatine nivîsîn.

Û wê demê dê dest bi serdema nû ya lêgr'erînên dîroka *Medya kevnar* û *K'urdistanê* bibe.

**Têbînî:**

Li jêderka (lînka) jêrê bitikînin, ji bo ku şêwazê kurt ê vê hevpeyvînê bi zimanê t'irkî bibîninn: http://mezopotamyaajansi35.com/tum-haberler/content/view/157753

Hevp'eyvîn **di dema xwe da** bi zimanê r'ûsî pêk hatibûye**.**

**Çavkanî;**

https://www.academia.edu/68077406/Зороастризм_и_мидяне_интервью_
http://kurdistan.today/зороастризм-и-мидяне/74609/

Werger – a Maida Kurd e.